

Sipasnameya Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Hewwelatîyên birêz!

Xelkê azadîxwaze Kurdistanê!

Roja îne 1'ê Reşemeya sala 1382'e Rojî (20.02.2004), rejîma Komara Islamî a Îranê li gor bernamaya berê bi nav hîlbijartina gera 7'an a Meclîsa Şêwra Islamî lidar xist. Hîlbijartinek ku tevî hemû karhêsanî, karsazî û piropagendeyeke zaf ku rejîmê bi merema rakêşana xelkê bo ser sindûqên dengdanê bo kiribû, tev sariyeke tewaw û bêtefavetîyeke berbiçave xelkê di seranserê Îranê da berengar bû û "NE" a wê carê ji "ERÊ" a cara berê ku her duyan bi wateyekê, yanî nexwestina rejîmê di tewahiya xwe de hate eyan kirin, girê da.

Heke ev sarî û bêtefavetîye hemberî hîlbijartina gera 7'an a Meclîsa Şêwra Islamî di Îranê de xuya û berçav bû, di Kurdistanê ne tenê ev sarî û bêtefavetî bi wê qasê ron û eşkere û ev hinde zaf û hemû alî bû ku wê naçe dezgehên piropagendeya rejîmê jî bikaribin haşatiyê lê bikin, belku di rojên pêş hîlbijartinê de jî tevî xwenîşandan û rêpêvan û meşa bi qazindeye xelkê berengar bû. Ev haleta û ev helwest girtina civatên xelkê Kurdistanê di hemberî hîlbijartinekê ku pêştir Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê û zaf ji hêzên siyasî ên Kurdistanê û Îranê bi heq û rewa baykot kiribûn, di rastî de her wek bi wateya "NE" gotin bi rejîmê ye, wateya piştgirî kirina hemû alî û hertimî a wan ji tevgera azadîxwazane xwe bi rêberatiya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ye û mînakê ji hevdengî, hevpeşengî û hevdiliya xelkê Kurdistanê di orta xebata dijî dîktatorî û bo bi destve anîna azadî, demokrasî û misoger bûna mafê neteweyî ye. Lewma em bi hewce dizanin hurmetê ji wê helwesta qurs û qahîme wê hevdengî û yekparçe bûnê bigirin û sipas û pêzanîna PDK Îranê bi kit-kite kesên ku bi pêşwaziya gaziya baykota (pişikdarî nekirin) hîlbijartinê ji hêla Partiya Demokrat ve çûn rabigehînin, di wê derheqê de helwesta ew kesên ku pêştir jî berendam bûna xwe ragehandibûn û zêdebarê evê jî ku kêrhatî bûna wan hatibû pejirandin, berendametiya xwe wergirtin û bo aliyê xelkê ketin û nebûne emraz û kersa destê kevnarperwerî û dîktatoriyê li bi encam gehandina merem û armancên qirêj û mirare van bi gaveke jêhatî û kareke bi cih dizanin.

Em destê kit-kite wî xelkê zana, têgihîştî û pêgihîştî digivîşînin û serkeftina van di xebat bo gihîştin bi azadî û mafê neteweyî re bi hêvî dixwazin û em erxayîn in ku helwesta wîha cesûrane û hevdengî û hevdilî a wî awayî roj bo rojê me li serkeftin û bi armanc gihîştinê nêzîk diket.

Careke din jî sipas û careke din jî aferîn bo helwesta camêraneye we.

Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

**Şemî, 2'ê Reşemeya 1382'e Rojî
21'ê Februarya 2004'e Zayînî**

Yekemîn Festîvala Wêjeyî a Rojhelatê Kurdistanê (Tarawge) hate lidarxistin



Roja şemî 14.02.2004'ê hemberî 25.11.1382'e Rojî rê û resma dest pê kirina yekemîn Festîvala Wêjeyî a Rojhelatê Kurdistanê (Tarawge), bi pişikdariya hejmarek zaf ji helbestvanan, nivîskar û hunermendan û her wisan bi amade bûna sedan kes ji hogirên Çand û Edeba Kurdî, li yek ji salonên binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê hate lidarxistin.

Li heyamê çend roj civînên vê Festîvalê, helbestvan, nivîskar û rewşenbîrên pişikdare Festîvalê hin helbest, çîrok û bas û lêkulîn pêşkêş kirin.

Raja 18.2.2004'ê piştî bi rêve çûna serkeftina yek bi yek ji wan bernaman, rê û resma ragehandina encama nîrxandina berheman ji aliyê daweran û pêşkêş kirina xelatan bi berhemên serkeftî, dawiya Festîvalê hate ragehandin.

Xelkê Merîwanê û Bokanê xwepêşandan li dar xistin

-Şeva çarşembî 18.02.2004'e Zayînî hemberî 19.11.1382'e Rojî xelkê bajarê Bokanê bi lidar xistina meşekê, nerazî bûna xwe li hember çawaniya bi rêve çûna hîlbijartina gera 7'an a Meclîsa Şêwra Islamî eyan kirin. Di wê meşê de ji bilî wê çendê ku dirûşmên dijî rejîmê hatine gotin, şûşe û pencereyên çend bank û avayî ên dinê ye rejîmê ji aliyê xelkê ve hatin şikandin.

-Piştî nîvroya roja çarşembî 18.02.2004'e Zayînî, hemberî 19.11.1382'e Rojî xelkê Merîwanê serbarê wê çendê ku hêzekî zafe rejîmê di nav bajar de bûn, bo cara duyê bi lidar xistina meşekê, nerazî bûna xwe ji çawaniya bi rêve çûna hîlbijartina gera 7'an ya Meclîsa Şêwra Islamî eyan kirin û bi dijî rejîmê û bi tagirî ji bizava Kurdistanê dirûşm avêtin.

Korên behî û serexweşiyê

Li Kurdistanê Îranê û derveyî welat

Bi merema hawderdî bi malbatên goriyan û mehkûm kirina terorîstan

Xelkê Kurdistanê Îranê li hundir û derveyî welat, piştî belav bûna nûçeyê cinayeta roja cejna Qurbanê li bajarê Hewlêrê, bi awayên cur bi cur hevderdî û hevxiyamiya xwe bi serokatiya PDK û YNK'ê û malbat û kes û karên goriyan nîşan dan û ev kiriyara hov ya terorîstî bi tundî şermezar kirin. Di rûpelê 13 a vê hejmarê **Agirî** de çend nûçe û rapor di vê derheqê de ketine ber çavên ve xwendevanên hêja.

Amerîka li dîv berjewendiyên xwe digere (Beşa.2) 4	Terorîst, çi ji canê xelkê Kurdistanê dixwazin 7	Bizava Kurdî di bin bandora ramana Ostoreyî de 10	Demokrasî, biha û piraktîka wê (Beşa 1.) 11
-----------------------------------------------------------------	---------------------------------------------------------------	----------------------------------------------------------------	----------------------------------------------------------



Daxuyaniya Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê

Seba 25'mîn salvegera serketina serhildana gelên Îranê

Hewwelatîyên birêz!

Xelkê xebatkare Kurdistana!

22'ê Rêbendana ev sal, 1382'e Rojî (2004'e Zayîni), 25 sal ji serkeftina serhildana pir hêjaye gelên Îranê bi dijî rejîma Paşayetî derbas dibe. 25 salan berî niho di meha Rêbendana sala 1357'e Rojî de (1979) civatên xelkê Îranê piştî salekê serhildan û xwîn û qurbanî danê dawî bi temenê rejîma Paşayetî û deshilatdariya Mihemed Riza Şah anîn. **Merem ji hiloşandina rejîma Mihemed Riza Şah û serkeftina şoreşa gelên Îranê ewa bû ku hikûmeteke Demokratîk binine ser şolê ku azadî û Demokrasiyê misoger bike, mafê gelên zilm jêkiriye Îranê bi destve bîne û ferq û cudahiye di nebera netewe û olên cur bi cur da ji nav bibet.** Lê mixabin ne tenê ew hêvî û xwazîên pîroz bi destve nehatin, belku welatê me tev deselateke dîktatoriya rût û bê perdetir berengar bû. Çunku di nebûna alternatîveke demokrat û zal bûna hewayê olî da Melayên pawanxwaz gelek zû dest bi ser destkevtên Şoreş û serkeftinê da girtin û di bi nav refrandomekê de xelk neçar bûn di navbera Rejîma Paşatî û Komara Islamî (ne peyvek zêde û ne peyvek kêr) de yekê hilbijêrin.

Her çiqas wî çaxî gelê Kurd û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê û hêzên Siyasiye Kurdistana dizanîn ku rejîmeke weke Komara Islamî ku li ser bingeha hizr û ramanên olî werê ava kirin, ne azadî û demokrasi misoger dibe û ne gelên Îranê bi mafên neteweyî û miroviye xwe digihîjin, ew refrandomê baykot (tehrîm) kirin, lê xelkê Îranê ku rejîma Paşatiyê ceribandibûn û bi dijî serhildan kiri bûn, edetî û ne awarte bû heke dangan bi rejîma Paşayetî nedin û di hember de deng bi Komareke Islamî bidin ku heta wê demê ne mêze kiribûn û ne jî hatibû ceribandin.

Rejîma Komara Islamî ku li ser bingeha hizr û ramana olî û bawerî bi Welayeta Feqîh hate ava kirin, ne ev azadî û demokrasiye cih girt û ne bihagiranî bi mafên mirovî û

neteweyî ên gelên Îranê da. Lewra her li destpêkê ve bi riftara serberedayî û kiryarên ne demokratîk

kakila kevnarperwerane û dîktatoriya xwe nîşan da. Partî û rêxistinên siyasî ên pêşkeftinxwaze neyasayî yan nefermî û hilweşandî ragihand û serok û endamên wan ketin ber êrîşa girûpên olhişke rejîma taze bi deshilat gihîştî, hezaran xortên şoreşvan û azadîxwaze welatê me bi hêcetên cur bi cur îdam û bo girtîgehan hatne rapêç kirin û gelek bi tundî hatin îşkence û azar dan. Rojname û Kovarên serbixwe û cuda hizr hatine qedexa kirin û berahiya weşan û belav bûna wan hate girtin û her hegereke dijber yan heta hizrek cuda ji raman û nêrinên rêberên rejîmê bi xurtî hatin tepeser kirin. Gelên zilim jê kirî ên Îranê di Belûçistan, Turkmen Sehra, Xozistan û Kurdistana ketne ber êrîşa berfireh û tepeserkeraneye hêzên rejîmê û girûpên tundrê û olhişk ên ser bi rejîmê bi awayekî livlivîn bi wan re kirin ku kêr hêzên dagîrker tev xelkê walateke dagîrkirî diket. Heta hejmarek ji wan Melayan jî ku hevhezir û hevalên girûpên bi deshilat gihîştî bûn, lê carna car gazinde û lomeyek ji kiryarên deshilatdaran dikirin, ji êrîş û girtin û bê hurmetî pê kirinê nehatine bê par kirin û heta hejmarek ji wan bi awayeke cihê şik û gumanê ji holê hatin ra kirin.

Heke di pêvajoya wan tepeserî û êrîşan de rejîma kevnarperwer karî berahiya parek ji gelên Îranê bigire û bi zorî û kuştinê bê deng û kir biket, di Kurdistana de tevî berîkanêyek bê mînak berengar bû. Gelên Kurd bi ber xwedanî û berevanî ji xwe bersiva êrîşa leşkerî ya hêzên rejîmê da. **Ew berîkanî û berxwedaniye her çiqas hezaran gorî, kuştina bi kome xelkê bi dehan gundan, topbaran û bombebaran kirina bajarên Kurdistana û hisara aborî û ... li peyre bû, lê ev şanazî û serfiraziye bo gelê Kurd hebû ku li hember rejîmê de bi çokda ne hêt û serbilindane Kurdistana bike çepera berevanî kirin ji azadiya**

Îranê û xebat ji bo demokrasi û bi destve anîna mafên neteweyî bidomîne.

Bi destpê bûna şerê Îran û Îraqê û pêçeçandina rejîmê li ser domandina wî şerî ku Sedan hezar kuştî û dehan hezar birîndar û seqet û sedan milyar Dolar xisar û ziyana malî lê ket, ji aliyê rejîmê ve wek neemet dana "Ilahî" (xudê)!! Dihate mêze kirin, çunku li teniştava vî şerî de gelên Îranê û azadîxwazên welatê me bi awayeke berfireh êxiste ber êrîşa hêzên kevnarperweriyê û kiryarên wisan derheq bi xelkê Îranê bi giştî û Kurdistana bi xasmanî encam da ku mirovayetiye ji bas kirin û vegêranewa wê şerm heye.

Piştî ewê jî ku Xumeynî neçar bi vexarina Cama Jehirê û ragirtina şer hate kirin, Komara Islamî dest ji dujminatî û tepeserî a azadîxwazan hilnegirt, berevajî wê çendê, hezaran zîndanî bê mehkeme yan heta piştî derbas kirina heyamê hepsa bi ser wan sepandî, bi kom û di heyamê yekdu mehan de îdam kirin û kesayetiye opizisyonê li derveyî welat êxistin ber êrîşa xwe ya terorîstî. Torên sîxor (ajan) û terorîstî ên rejîmê bi sedan rêber û kesayetiye azadîxwaz di welatên cur bi cure cihanê hatin teror kirin û bi wî awayî vê rejîmê bi terzeke ne ragehandî fermiyet bi terorîzma dewletî da. Di çarçoveya bîr û hizra hinartina şoreşê bo derveyî welat de û destêverdana di kar û barên hundirê welatên cîran û derve de bûye siyaseta bi kiryare Komara Islamî û ewa jî bûye hegera têkderî û avar xistina di welatan û têkiliyên rejîmê tev pişkek ji welatan de bo aliyê lewazî û sariyê bir û rûmetê mirar û biyom û rastîne vê rejîmê xiste ber çavê bîr û raya giştî.

Siyaseta dijberî kirina rejîmê bi gelên Îranê re ne her bûye sedema bê par bûna xelkê welatê me ji maf û azadiyên wan, belku hildan û xurt kirina komek berçaviyên biyome civakî wek gendelî, îtiyad, çûne sera qasê bê soliyê, nebûna tenahiya canî û malî bo hevvelatîyan, derperandin û neçar kirina kesên şareza û pispor bo derveyî welat û zêde bûna qasa

Daxuyaniya Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê
 Seba 25'mîn salvegera serkeftina serhildana gelên Îranê
Doma rûpelê 2

hejarî û belengaziyê bi awayekê ku niho parek berbiçav ji xelkê welatê me di bin hêla feqîrî û belengaziyê da dijîn.

Hemû ev rewşa tal û xirab, xelkê Îranê ji rejîma Komara Islamî vêzar kir û bi dane eyan kirina nerazî bûna xelkê ji vê rejîmê û di şêl û terzên cur bi cur de roj bo rojê berfirehtir û micittir kir. Her qas ew eyan kirina nerazî bûniyê bi awayê herî xurt hatine tepeser kirin, lê pişkek ji kesên nav deshilatdariyê anî ser vê bawerê ku domandina deshilatdariya Komara Islamî bi terzê bihorî îmkân nine û bo hêvir kirina xelkê dibê guhertineke berteng di terzê livîn û riftara rejîmê de pêk bînin. Di aqibeta vê nêrîne de baskek bi navê Reformxwaz di nav deshilatdariya Komara Islamî ser hilda ku dirûşmên guhertinxwazane ên berteng hilgirtin. Wî baskê deshilatdariyê karî bo heyamê 4-5 salan bala pişkek ji xelkê û nemaze parek ji dewletên welatên derve bi xwe mijol bike û hêviya hinek guhertinan bide wan. Lê wî baskî tevî ewê ku di van salên dawiyê de him dezgeha birêvebirî û him jî Parleman di dest de bû û Serok Komar jî ser bi wî baskî bû, nexwest û ne bi kiryar jî karî pêngaveke berbiçav bo bi destve anîna van guhertinên berteng jî ku bi xwe dirûşm hilgirtibû, havêje. Berevanî kirin ji **Kuştinên Rêzikî** û bêser û şûn kirina azadîxwazan, nivîskar û rewşenbîran, tepeser kirina bixwîne xwendekaran, girtin û qedexa kirina dehan kovar û rojnameyên serbixwe ên cudahîzr jî her di vî heyamî de qewimîn ku vî baskê bi nav Reformxwaz ne tenê her nekarî berahiya vê pêvajoyê ji tepeseriyê bigire û helwesteke micit ji xwe nîşan bide, belku bi kiryar û nemaze Serok komarê bi nav guhertinxwaz di helwest girtin û dane eyan kirina hizr û nêrînen xwe de zêdetir bo aliyê pawanxwazan de ket û hevdengî û hevpeşgavî tev wan kirin û tev dikin.

Ev terzê serederiya bi nav guhertinxwazan bûye sedema bêhêvî bûna pareke berbiçav ji ewên ku bi pêkhatina guhertinan di Komara Islamî a Îranê de hêvîdar bûn û hêdî-hêdî ji vî baskî jî derketin.

Serderî û îdeayên bi nav guhertinxwaz ku bi kiryar çî ji bo xelkê Îranê lê şîn nebûye, ev rastiye selimand ku di çarçoveya vê rejîmê de pêk hatina çî guhertinekê bi vêc û qazancê xelkê îmkân nine. Lewma pişkeke berçav ji alîgirên wî baskî jî nemaze di wan dawiyane de tevî bêtefawetî li hemberî wî baskî rû bi rû man yan ber bi girtina helwesteke jêhatî û micit û hevdeng bûn ligel xelkê û xebata giştî a gelên Îranê palda. Bê tefawetiya xelkê hemberî vî baskî û bêhelwestiya wan vî demê pitir derket ku hejmareke berbiçav ji nonerên Meclîsê ku zêdetir ser bi vî baskî bûn û bi gazinde bi mendel û betal kirina kêrhatî bûna berendamên ser bi vî baskî di Meclîsê de giriv girtin û hate dîtin ku ji aliyê xelkê û heta parek ji dezgeh û damezravên ser bi vî baskî jî piştgirî ji van nehate kirin û bi bêtefawetî mêzeyî van kirin.

Hevwelatîyên birêz!

Em di rewşekê de 22'ê Rêbendana îsal, bîst û pêncemîn salvegera serketina Gelên Irene bi bîr tînin ku rejîma Komara Islamî û dîktatoriya Welayeta Feqîh pitir ji hemû demeke berê tevî kirîz (qeyran)ên cur bi cure hundir û derveyî berengar e. Ji aliyekê nerazî bûna xelkê û xebata tev alî û giştîyê xelkê welatê me bo gihîştin bi azadî, demokrasî û bidestve anîna mafên neteweyî ên gelên bin sitem û zordariya Îranê û vêde birina ev hemû zilm û zoriya ku di warên cur bi cure jiyane da ji vî xelkî tê kirin, roj bo rojê di geşe kirin û xurt bûnê de ye û nemeşrûyî û ne berheq bûna vê rejîmê pitir aniye holê, ji aliyekê din ve ev guhertinên ku di herêma Rojhilata Navîn de pêk hatine, nemaze ku li Efxansitan û Îraqê du welatên cîran da bi encam gihîştina rejîma Komara Islamî tengaviyeke xasmanî rû bi rû kiriye. Siyaseta rejîmê jî di peywendî tevî terorîzm û penadan bi deste û girûpên terorîstî, cehd kirin bo dest pêragihîştin bi çekên tevkuj, dijberî tevî pêvajoya aştiya herêmê û destêverdan di kar û barên hundire welatên cîran de her weke berê didome û givaşeke navneteweyî ya zêdetir bo ser rejîmê li peyre bûye.

Di rewşeke wiha de û di pêvajoya xebata dijî Komara Islamî de bi cih e hemû hêzên opozisyonê û civatên xelkê Îranê refên xwe pitir hevgirtî bikin û çî qasa giringiyê bi hîloşîna rejîmê didin, wê qasê jî bo pêşeroja Îranê û anîne ser kara rejîmeke demokratîk ku demokrasîyê bi wateya rasterast desteser bike, Mafên gelên Îranê bi fermî binase û misoger bike û jiyana û rabihartina xelkê bo aliyê başiyê bibet, xwediyê bernamê û hevdengî û yekhelwestiyê bin. Çunku xincî ewê, tîrsa dudese bûna ceribandinên serhildana pir hêjaye gelên Îranê û hatine ser kara rejîmeke dîktatorî ya dinê gefê ji pêşeroja Îranê û qedera xelkê welatê me dike.

Bi cihe ku welatên derve jî bi giştî û ewên ku bi dijî dîktatorî û terorîzmê ne û alîgiriyê ji azadî û demokrasîyê dikin, bi xasmanî rastmêzane çav ji karnameya tijî şerm û eyb a 25 salan deshilatdariya Komara Islamî û bînpê kirina mafê mirovan bikin û çavekê bi têkiliyên xwe tevî vê rejîma dijî mirovî de bigêrin û xwe ji wan peywendîyan biparêzin ku rasterast û ne rasterast alîkariyê bi domandina deshilatdariya vê rejîmê dike, ji vîne jî zêdetir, ji xebata giştî û azadîxwazane a gelên Îranê di şêl û awayên cur bi cur û Osûlî de piştgiriyê bikin û ji vê rêyê ve alîkariyê bi cihgir bûna demokrasîyê li Îranê û aşti û tenahiye di herêmê de bikin.

Bi vê hêviyê ku 25'mîn salvegera serkeftina serhildana gelên Îranê bibe destpêka xebateke tevîlîtir û hemû alîtir bi dijî rejîma Komara Islamî û dawî anîn bi temenê wê, û di ser fêslên dema pêşerojê da tenê wek berevaniyekê ji dîrok û bi mînak anîna dîktatoriyeke reş û deshilateke kevnarperwerane, lê nêrînekê lê bidin.

Bihiloş e rejîma Kevnarperwer, dîktator û serberedayî a Komara Islamî

Serkev e xebata azadîxwazane a gelên Îranê bo gihîştin bi azadî, demokrasî, bi destve anîna mafên neteweyî

**Deftera Siyasî ya PDK Îranê
 20'ê Rêbendana 1382'e Rojî
 6'ê Februarya 2004'e Zayinî**

Amerîka li dîv berjewendiyên xwe digere

(Beşa.2, dawî)

M.Emîn

Kurd û guhertinên deverê

Bi vî terzî Amerîka şerekî giran, dirêj heyam, pir mesref û xofbar bi merema bi dest ve anîna qazancên dirêj heyame xwe û dostên xwe li warên: Petrol, ewlekarî û ... di Rohhilata Navîn de dest pê kiriye.

Ev şere, şerekî bi serda ketî li ser rikeberiyê yan ne lêkdayî û ne nirxandî nine, belkî berevajî vê hindê, paşî dane berhev û lêkdana hemû zirarên canî û madî ên vî şerî û, nirxandina karînen xwe û aliyên din ên bi hêza leşkerî pangurî û rol diyarî ker e vî şerî, mil daye ber vê bahozê. Lewma jî me dît ku eger li şerê dijî hukûmeta Taliban, Rêxistina Neteweyên Yekgirtî tevî Amerîkayê hevalbendî kir, lê di şerê dijî Îraqê de ev rêxistine bi dijî hevalbendiya Amerîkayê rawesta, bi milyonan xelk li para zafe welatên cîhanê hatine ser kolanan û dijberiya xwe her ji dest pêkirina vî şerî de ragehandin û kar gihîste vê hindê ku xofa şeş bûna Rêxistina Neteweyên Yekgirtî û Nato'ê hate pêş û givaşek mezin xistine ser Amerîkayê da ku şer dest pê neke û paşî dest pê kirina şer jî ev givaşek bi merema paşda kêşana berdewam bû, lê hemû ev cehdane bê mifah bûn û Amerîka ji bilî tab anîna wan hemû zirar û xisarên ihtimalî, şer dest pê kir. Ev dest pê kirine jî niha li dijî Îraqê û paşê jî li dijî welatên dine deverê ye, bo pêk anîna wan guhertinên ku li serî de me îşare pê kir.

Hikûmetên deverê, ku xwe baş dinasin û dizanin ev xofa zaf micid û nêzik e, bi nepenî û bi eyanî li dijî vê piroseyê ref girtin. Evan ku dizanin eger ev piroseyê bi vî terzî biçîte pêş, dê li pêşerojê de deshilata dijî demokrasî û dijî miroviye xwe ji dest didin, ketine berevanî kirin ji Sedam Husênê dîktator. Dezgehên ragehandin ên wan, fitwa ya rêberên olî ên kirêgirtiyê xwe û bi giştî her çî li ber destê wan hebû xistine şolê bo vê ku di hember vê bahoza bi hêz de ku ketiye rê parêzgarîyê ji deshilata lerkoke xwe bikin.

Aqibeta wan cehdane bû sedema vê ku eniyek li hikûmetên dijî xelkiye deverê, Islamî ên siyasî, hindik ji komonîstên kilasîk nekirî tevî girûpek ji fidayî ên Sedam Husên pêk bûn û bo terora leşkerê Amerîka û hevalbendên wî bixebitin.

Herifandin û têkdana sazî û avahî ên Îraqê, têkdana hêlên: Av, Elekterîk, petrol û gazê, talan kirina nexweşxaneyan, kuştina xelkê sivîl û bêberevan e Îraqê bo vê ku bi hizra wan dijî hêzên Amerîkayê serhildanê bikin û wan ji welat derbixin û carek din deshilata Sedam Husên yan tişteke dine wilo di Îraqê da sax bikin.

Hindek ji xelkê reş û rût û lê qewimiye destê Sedam Husên jî ku dibû dijberî wê eniyê baştir ji ya ku niha heye, xwe dabana aliyê hêzên Amerîka û hevalbendên wan, lê em dibînin parek ji vî xelkî dijberî berjewendiyên xwe ketiye aliyê zordaran. Ewana kesane in ku wekî li berahiyê de me bas kir bi sedemên cur bi cur – ku lêre de em bas nakin – şiyana ji nahev deranîna rewşê ninin û qazanc û zirara dirêj heyame xwe nanasin. Lewma berevajî berjewendiyên xwe ketine nava vê eniya ku dijberî wan bizavê diket.

Lêre da ev pîrse têtê holê ku dibe Kurd tevî kîjan eniyê bikevin?

Her çend ev welatên Rohhilata Navîn ku Kurdistan di nava wan de hatiye parve kirin, hikûmetên dîktator – lê ji hev cuda – têtê hene, lê di hemûyan da Kurd wekî hevvelatîyê pile (derece) 2 tên mêze kirin. Di wan dewletane da para Kurdan tenê kuştin û hepsî kirin û kawil kirin e. Her bizaveke azadîxwaziye wan bi hêceta kevin û gemare cudahî xweziyê bi terzekî herî tund tê pelçiqandin, rez û baxçeyên wan tên şewitandin û gundên wan tên kawil kirin.

Kurdan bi dirêjîya sedsalên derbas bûyî dijberî vê zilm û zordariyê ku derheqî wan dimeşe, xebat kirine, şoreşên wek: Simayîl Axayê Şikak (Simko), Şêx Mehmûd, Ararat, Barzanî, Komara Kurdistanê û dehan tevgerên mafxwaziye din di bihost bihosta axa parvekirî de serî hildane û bi sedan hezar ji xortên vî gelî, di rêya daxwaza destpêkîrîn mafên xwe da canê xwe gorî kirin e. Şovînzîma navxwe, piştgiriya dewletên qazancparêz û pêşketiye Sanatî, bi çek û cebirxane ên teknîkiye herî pêşketî, bo tepeser kirina bizava Kurdistanê delîveya evê neda ye ku Kurd jî wekî mirovên vê demê li ser axa xwe kêmtirîn hisabek bo bête kirin. Kar gihîste cihekê ku lawên Kurd xofa xendiqandin, kuştin

û hepsê qebûl bikin û bi hemû terzekê ji welatê xwe birewin û penaya xwe bibine ber welatên din. Evên mayî jî bi neçarî di Kurdistanê da bimînin ku bo wan weke zîndanekê lê hatî ye.

Di rewşek wilo da, Amerîka wekî bihêztirîn hikûmeta vê cîhanê bêyê vê ku pîrse ji dewlet û xelkên deverê biket, bo parastina qazanc û berjewendiyên xwe programekê di vê deverê de dest pê dike ku xewn û xweziya sedsaliye Kurdan e.

Ev dixwaze:

**Hikûmetên dîktator û pawanxwaz biherifîne û deshilata wan di nava xelkê da bête parve kirin.*

**Alîkariyê bide ava kirina sistemê demokratîk ku nonerên xelkê têtê xwedî deshilat bin.*

**Heyî û serweta welat ku di nav lepê hikûmetên serberedayî û tagirên girêdayî e wan de bûye, bo xelkê wegerîne û rê ji bo bazar û Aboriya Azad veket.*

**Terorîzmê weke diyarokek dijî mirovayetiye ji bin ve derîne.*

Bi vî terzî erê tu bêjî bi hilket û bo yekem car nine ku qazanc û berjewendiya dewletek xwedî hêz tevî qazanc û berjewendiya Kurd û hemû gelên bindeste deverê hev girtî dibe?

Di vê rikberiyê de wezîfa (erkê) Kurdan çî ye?

1.Xwe bide aliyê wan hikûmetên ku me pêşda basa wan kir, berevaniyê ji wan bike û xwe bo wan bide kuştin? Bo çî û di pêxema çî da? Çî heye ku ev hikûmetane bo Kurd diparêzin? Gelo bi guhertina wan hikûmetane, cuda ji dilî û êxsîrî û zelûliyê çî ji dest diçe?

Şovînist û hikûmetên wan di demek wilo de ku dikevina xeterê da, dezgehên piropagendeya xwe dixin kar û dixwazin bi biziwandina seha neteweyî, seha olî, hêrişaya biyanî û sedan fend û fêlên dine vî terzî, xelkê ji bo kuştinê li dewra xwe kom bikin. Ji ber ku tenê di wan demane da xelk tê bîra wan. Lê kîjan biyanî peyda dibe ku xiraptir ji wan hikûmetên dijî gelî netewe, ol, ax û welatê Kurdan bin pê bikin û rehmkê bi vî xelkî nekin? Lewma çî kurdeke azadîxwaz û welatparêz di vê rikeberiyê de berevaniyê ji wan hikûmetane naket.

2.Piştaya xwe bide hêzên Amerîkayê?

Li berahiyê de me bas kir ku hêza Kurd bi tenê karîna herifandina hikûmetên deshilatdar nebûye, kê dibêje heta eger biherifîne jî, kompilooya dewletên cînar e hevhezir û

hevgirtî li dijî Kurdan iznê didin ku deshilata diilxwaze xwe bîne ser hikim. Lê hebûna hêza Amerîka li deverê û cehd kirin bo herifandin yan her nebe bêhêz kirina wan rejîmane delîveyeke baş pêk aniye. Amerîka li deverê de bo bi cî anîna vê piroseya ku dest pê kiriye, pêdivî bi arîkar û hevalbendan heye. Kurdan jî bo ramalîna wan rejîmên Kurdkuj û dijî azadiyan pêdivî bi hevpeymanek bihêz hene.

Kurdên Îraqê di vê pêwendiyê de roleke baş hebûne û karîne baweriya Amerîka û hevalbendên wî, berî herifandina hikûmeta Sedam Husên, li dema şer û paşî ser jî bo aliyê xwe rakêş in û bibine hevpeymanek base Amerîkayê. Lewmanê jî pareke baş ji deshilata vê pişka Kurdistanê ketiye ber destê wan, cuda ji wê li hikûmeta Bexdayê da jî pişikdar dibin. Niha Kurd li tewahiya vê parê de deshilata îdare kirina xwe bi destve girtî ye, li dahata giştîye Îraqê de pişka vê jêre tê berçav girtin, ew Kurdên ku li heyamê sî û çend salên deshilatdariya hikûmeta Bees li devera Kurdakincî bi xasmanî li devera Kerkûkê bi zorî ji mal û axa xwe hatibûn derkirin, niho hêdî-hêdî mijol in wan dizivîrînin bo ser axa bav û kalên wan û basa ewê jî heye ku zirar û ziyana ji wan ketî jî bê bedel namîne. Hemû girtî ên siyasî li her ciheke Îraqê ku bi salan di hepsxanên vê rejîmê de hepsî bûn û cihê para zore wan bo kesê diyar nebû, hatine azad kirin. Dujminên sereke ye Kurd weke: Dewletên Îran, Tîrkiye û Sûriye ji tîrsa Amerîka nawêrin bi êşkere dijberiya gelê Kurd bizavekê bimesînin û leşkerê xwe bînin ser Kurdan, xelk ji eyan kirina bîr û bawerî a xwe azad e û kes nikare pêşîya wan bigire, pirojên avadan kirinê, cansaxiyê û ... bi terzeke berbiçav dest pêkiriye. Zaf programên din jî li ber dest da hene ku dibe li pêşerojê de werin cî bi cî kirin, bi vî terzê ku Amerîka ragihandiye dê Îraqê bikete nimûneyek ji demokrasîyê, avadanî û pêşketin û xweş derbas kirina xelkê li deverê da, bo vê ku xelkên welatên dine deverê jî hêvixwaz bin û bixebitin rewşek wilo bo wan bête holê û Kurdistan jî bibe nimûneyek li Îraqê da. Lê eger piroje û sozên pêşerojê jî danêne aliyekê, her ewa ku heta niha li Kurdistanê hatiye kirin û pêştir me basa pişkeke vê kir, bes e bo vê ku Kurdan di hemû parçeyan da û hemû xelkê Îraq û deverê bigehine vê encamê ku Kurd li hevalbendî tev Amerîkayê nek her qazanc kirine, belkî ev deskevtên ku mêjve bû hêvî bo dikirin, niha dest ve anîn e.

Nirxandinek serpeyî di navbera rewşa niho ye Kurdistanê û pişkên dine Îraqê li nawerast û Başûrê wî

welatî rastiya vê ramanê bi tewawî eyan dike. Di halekê da li Kurdistanê xelk ji xweşî û şahiya rizgar bûn ji zilm û zordariya hikûmeta Bees, mijolê avedan kirina welat in, ewlekarî û geşe kirin di hemû wareke jiyane de berbiçave û heta Erebi di pişkên dine vî welatî de bo bêhnwedan û hilmijîna nefesek azad mijolî geşt û geriyana di nav Kurdistanê de ne. Li halekê ku di hindik pişkên dine vî welatî de şer û kuştin û kawilkarî û nebûna tenahiye her wa dom dike. Lêre da pêdivî ye îşare bi vê rastiye bête kirin ku pişkek ji vê rewşa base ku di Kurdistanê da heye, ji vê hatiye pêş ku Kurdistan li sala 1991'ê ve deshilata Sedam Husên û Partiya Bees hindavî serê vê nemaye, lê xwe eve jî her wa bi belaş nebûye, belkî di kiryar da di bin givaş û bandora Amerîka de pêk hatî ye.

Parçeyek din ji Kurdistanê ketiye nava Îranê, hikûmeta Îranê jî yek ji armancên Amerîka ye, her nebe ji ber vê ku:

***Bi dîtina Amerîka yê ve di tewera şeytanî de ye.**

***Dijî Demokrasî û azadiyê ye.**

***Mezintirîn û biqawettirîn navenda pêgihandin û piştgirî kirina terorizmê ye.**

***Bo çê kirina çekên Etomî cehdê diket.**

Amerîka li ser evê sax bûye ku dibe hikûmeta Komara Islamî deshilatê bi cî bihêle, heke li vê peywendiyê da ferqê hebe di terz û çawanetiya ji holê rakirina vê hikûmetê de ye.

"Rialîst"ên nav hikûmeta Amerîka tagirê zêde kirina givaşa diplomatîk bo ser Îranê ne û tundrê jî ku bi "Mohafizekarên nû" hatine nas kirin, tagirê guherîna rejîmê ne(6). Ewropa jî hêdî hêdî ji ramanên Amerîka bo ji holê ra kirina Komara Islamî a Îranê nêzik bûye. Lê girîngtir ji bernamên derveyî bo guherîna vê hikûmetê îrade û daxwaza xelkê Îranê bo dane qiraxa vê rejîmê û îrane ser kare hikûmetekî demokratîk, bi dîr nayê zanîn ku givaşa her du aliyen (hundir û derveyî) hikûmetê ji nav lepên Melayan derbîne.

Em naxwaz in welatê me bikeve ber êrîşa Amerîka û rastî kawilkarî û kuştare bibe û hêvîdarin di bin givaşa xelkê azadixwaze vî welatî de Komara Islamî biherife. Lê heke hat û Amerîka sax bû ku hikûmeta melayên Îranê jî bi rêya hikûmeta Sedam û Elqaîdê ve bibe, hingê teklîf çîye?

Di rewşek wilo da dibe xelk berevaniyê ji deshilata Komara Islamî neket, eger hikûmeta Sedam Husên wek deshilateke Erebi cihê piştgiriyeke lawaze civaka Erebi bû, Komara Islamî ev piştgiriya lawaz jî li derve de çinabît, her çend ev hikûmete heta niha xwe bi pêşengê

welatên Islamiye cihanê danaye, lê cihê şikê nine ku li halek wiha da, welatên Islamî jî ku para herî zafe wan qedera Komara Islamî naxwazin heta ku xwe li ser vê rejîmê xirab bikin. Bi vî terzî rejîm li hundir û derve de bi tenê dimîne û hewara vê nagihîte çî derekê.

Bi giştî ev mijare û şunwarê kurt heyam û dirêj heyam, êrîşa Amerîka bo deverê li ser Kurd û gelên din, berjewendî û egera encamên nebase wê pêdivî bi têrmanek zêdetir heye û hewceye hêzên siyasiye Kurd di vê têkiliyê de zêdetir xwe biwestînin. Bi xasmanî niha ku ceribandina Kurdên Îraqê jî li ber çav e.

(6). *Racir Hardî Mifsir, pişka Rojhilat, BBC, 30'ê July a 2003*

Hevdîtinek di navbera her du şandên PDK Îranê û Komelê da



Demjimêr 10'ê sipêdeya roja pêncşemiyê 6'ê Rêbendana 1382'ye Rojî, hember (26.02,2004'e Zayînî) şandeke serokatiya Rêxistina Kurdistanî ya Partiya Komonîst a Îranê pêk hatî ji birêzan: Birahîm Elîzade, Reşîd Şukîr Rezaqî, Reûf Perestar, Sirwe Nasîrî, Kerîm Ehmedî, seredana Deftera Siysî a PDK Îranê kirin.

Ev Şande ji aliyê heyetek ji birêveberiya PDK Îranê ve, ku pêk hatibûn ji birêzan: Elî Mêhrperwer, Mistefa Hicrî, Hesen Şerefî, Husên Medenî, Mistefa Mewlûdî, Fetah Kawîyan, Mihemed Nezîf Qadirî, Simaîl Bazîyar û Xedîce Mezûrî ve bi germî hatin pêşwazî kirin.

Her du Şandan di vê civîna 5 demjimêriye xwe da komek pirsên girêday bi guhartinên herîmê, Îran û Kurdistanê û terzên alîkarî kirina zêdetire hêzên Kurdistanî êxistine ber bas û gengeşê û bîr û hizrên xwe guhartin. Her wisan hewceyî ên pêwendîdar û tevrêyî jî pişkek dinêye basên vê civînê bûn. Şanda mêwan demjimêr 3:30'ya wê rojê ji aliyê Şanda PDK Îranê ve bi germî hatin birê kirin.

Şermezarî û sersaxî

Birêz Deftera Siyasî ya Yekîtiya Nîştimanî a Kurdistanê

Ligel silav û hurmetan
Kiryara terorîstî a roja 1'ê February'ê û di cejna Qurbanê de li buroya Melbenda 3 li Hewlêrê ku bûye sedema şehîd û birîndar bûna hijmarek ji kadroyên jêhat û çelenge meydana xebat û tekoşînê û hijmareke zaf ji xelkê Hewlêrê, ku di nava wan şehîdan de birêzan **Şaxewan Ebas û Xosrew Şêre û Bihruz Qeşqe û Dîdewan** tên xuya kirin, em bi tundî xembar kirin.

Tevî vê ku em vê kiryara terorîstîye dijî mirovahiyê şermezar dikin, behî û serexweşiya xwe jî pêşkêşî we birêzan û malbat û kes û karên şehîdan û hemû xelkê mafxwaze Kurdistanê dikin.

Em xwe di xem û kovanên de hevpar dizanin û baştir bûna her çiqas zûtir ji birîndaran re bi hêvî dixwazin.

Deftera Siyasî a PDK Îranê
13.11.1382 Rojî
02.02.2004 Zayînî

Birêz Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê

Ligel silav û hurmetan
Kiryara terorîstî a roja 1'ê meha February'ê û di roja cejna Qurbanê de, li buroya tayê 2 li Hewlêrê ku bûye sedema şehîd û birîndar bûna hijmareke zaf ji xortên şoreşvane gelê Kurd û Partiya xebatkare we, ku di nava wan şehîdan de birêzan: **Samî Abdulrehman, Şewket Şêx Yezdîn, Seed Ebdulla, Ekrem Mentik, Mehdî Xoşnav, Mehmûd Halo, Ehmed Rojbeyanî û Emîd Nerîmanî** tên xuya kirin, bi tundî em xembar kirin.

Bi vê sedemê tevî şermezar kirina vê kiryara terorîstî ye dijî mirovahiyê, em behî û serexweşiya xwe pêşkêşî bi we rêzdar û malbat û kes û karên şehîdan û hemû xelkê mafxwaze Kurdistanê dikin.

Em xwe di xem û kovanên de hevpar dizanin û baştir bûna her çiqas zûtir ji birîndaran re bi hêvî dixwazin.

Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê
13.11.1382 Rojî
02.02.2004 Zayînî



**Zor birêz Mam Celal,
Sekerterê Giştî yê YNK'ê!
Zor Birêz Mesûd Barzanî
Serokê PDK'ê!**



Nûçeya du kiryarên terorîstî li roja cejna Qurbanê, cejna xweşî û gerden azad kirina gelê Misilmane Kurd û tev Misilmanên cîhanê ku bûye sedema şehîd û birîndar bûna sedan kes ji endamên rêveber û xebatkarên PDK û YNK'ê û hevvelatîyên sivîle Kurd li Bajarê Hewlêrê, seh û wijdana hemû mirovên biwijdan hejand û kerb û vîzariya hemû hogirên Kurdan bizvand. Di vê navberê de bi awayekî taybetî şehîd bûna çend serrkirdeyên mîna Samî Abdulrehman, Şewket Şêx Yezdîn, Seed Ebdulla, Şaxewan Ebas, Xusrew Şêre û kadroyên jêhatîye dine PDK û YNK'ê bi zirareke mezin û bi cih nehatî tê hesabandin.

Bi vê sedemê ez ji kûrahiya dilê xwe serexweşî û hevxiyê xwe pêşkêşî we rêzdar û birêveberan û tev xebatkarên her du partiyan bira û malbatên rêzdarê şehîdên du kiryarên terorîstîye roja cejna Qurbanê dikim. Ji bo wan şehîdên serbilind biheştê berîn û hembêza Xudayê dilovan û domandina rêya wan û baştir bûna her çiqas zûtir ji birîndaran re bi hêvî dixwazim.

Birayên Serkirde!

Hevdem bûna wan du kiryarên qirêj û mirar eyan dike ku dijminên aşî û azadî û demokrasîyê dixwazin tole û heyfa cehda hevgirtin û yekxistina mala Kurd li du partiyan sereke yê bizava kurd li Kurdistanê Îraqê nehêlin. Ji ber ku di demê de hatin meşandin ku Partiya Demokrat û Yekîtiya Nîştimanî ji hemû deman pitir ji hev nizik bibûn. Hêviya min û hemû dilsojan eve ye ku ne her ev kiryara dijî mirovî nekare cehda dilsojaneyê birêveberên her du alîyan ji bo yekxistina her du îdare û civatên xelkê Kurdistanê ji kar bêxe, belku xwîna şehîdên vê bûyerê bibe ev cewhera ku peymanê aşî û tebahiyê bi wê bihê îmtza kirin.

Serbilindî ji bo şehîdên roja cejna Qurbanê, saxî, silametî û baştir bûn ji bo birîndaran û serkevtin ji bo xebata hêzên nîştimanî di pêxema bi destve anîna azadî, demokrasî û Federalîzmê de.

Tevî hevxiyêke kûr û berfireh de

Birayê we Ebdulla Hsenzade

Sekreterê giştîye Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

03.02.2004 Zayînî

14.11.1382 Rojî

Daxuyaniya Deftera Siyasî a PDK Îranê

Derheq kiryarên terrorist yê vê dawiyê li Bajarê Hewlêrê

Doma rûpelê 20

Şehîd bûna vê hijmara berbiçav ji xortên gelê Kurd, ne her bo PDK'ê û YNK'ê û gelê Kurd li Kurdistanê Îraqê, belkî bo hemû xortên neteweya Kurd li hemû parçeyên Kurdistanê û hemû mirovhezên seranserê cîhanê bûyêkî dil bikul û kiryarekî bijan bû ku dil û hindurê hemû aliyekî tejjî kul û keser kir û her di vê demê de jî kerb û kînekî zaf berengarî terorîst û mirovkujan kir.

PDK Îranê tevî şermezar kirin û riswa kirina wan kiryarên terorîstî û her kiryarekî terorîstî û kesên gelaedarêj û birêveberên wan, xem û keser û kovanên xwe jî bo ji dest dana goriyên wan kiryarên terorîstî beyan dike û behî û serexweşiya xwe pêşkêşî her du

hêzên bira, PDK'ê û YNK'ê û malbatên birêze şehîdan û hemû gelê Kurd li Kurdistanê Îraqê dike û xwe di vê xema giran û bi keser de bi şîrîk û hevpar dizane û sebr û sîboriyê bo hemû aliyekê bi hêvî dixweze û her di vê demê de jî hêviyê dixweze ku birîndarên wan kiryarên terorîstî her çiqas zûtir saxî û silametiya xwe bi destve bînin.

Ruha hemû goriyên vê kiryarê sad be û hêviyên wan misoger bin.

Deftera Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê
12-11-1382 Rojî
01.02.2004 Zayînî

Terorîst, çi ji canê xelkê Kurdistanê dixwazin?

Qadir Wirya

Roja cejna Qurbana îsal (1'ê Februarya 2004'an hemberî 12'ê Rêbendana 1382'e Rojî), du terorîst li du kiryarên hevdem û wekhev de, xwe gehandine nava tayê 2'ê PDK'ê û Melbenda 3'ê a YNK'ê li hewlêrê û rast di wê demê de ku hejmarek zaf ji xelkê bo pîroz kirina cejna Qurbanê di wan du bargehane de li hev civiya bûn, xwe teqandin û bûne sedema şehîd bûna dehan kes û birîndar bûna hejmarek zaf ji xelkê. Di nava goriyên wan du kiryarên terorîstî de, mixabin hejmarekî berbiçav ji berpirsyarên mezin û xebatkarên jêhate PDK'ê û YNK'ê tên dîtin.

Eve yekem car nine ku terorîstên mirovkuj li ser û bendê cejn û rojên pîroz û kêyfxweşiyê de dest bo kuştin û ji nav birina xelkê dibin û bi vî terzî cejnê ji xelkê Kurdistanê tal dikin. Her di wan çend salên derbas bûyî de terorîst li bajar û herêmên cur bi cure Kurdistana Îraqê de, çend carên din jî bi teqandin û xwekuştinê ve bi pêşwaziya cejnê çûn e. Kirêti û dijî mirovî bûna vê berçaviyê ji aliyekê û ji aliyê dinê jî duçar bûna car ji carê mezintir û bi xwîntire kiryarên hove terorîst li Kurdistanê, dixwaze ku em bi dîtinek kûr û berfireh ve mêzeyî bikin û zêdetir ji şermezar kirina wê, wekî tawanekî dijî mirovahiyê li ser binivîsin.

Teror, anko ji nav birina xelkê bê berevan û bêguneh û dest birin bo afirandina xof û hovîtiyê - ku di pêşema pêşde birina her cure meremekê de be - tişteki mehkûm û şermezar e. Her kes û alî û hêzek ku baweriyê herî kêm bi mafên mirovan û rê û cihên pîroze her civatgehekê hebe, neku her nikare berevaniyê ji teror û komkujiyê biket, belkî nikare ji wan cure kiryarane zehl û zendeqa wî neçe û dijberî wê neraweste. Eve hikmek e ku em dikarin derheq teror û terorîst li her cihekî vê çîhanê bidin. Lê ji bext û pêpalên xelkê Kurdistanê, ew terorîstên ku bask û zendên xwe ji kuştin û ji nav birina vî xelkê belengaz û zilim jê kirî hildan e, di refa pîstirîn û paremayitirîn terorîstên çîhanê de ne. Ji ber ku heke di zaf cihên

çîhanê de, gelek caran terorîstên dijî hêzeke biqawet, yan deshilatdar û aliyek ku piştgiriyê ji zilm û bê edaletiya siyasî, neteweyî, olî û tuxmî kirine û berevaniyê ji terzeke newekheviyê dikin, kiryarên terorîstî dimeşînin, li Kurdistanê terorîst bi dijî neteweyekê ku bi dirêjahiya jiyana xwe tevî zilm û kuştin, qirkirin, talan û bêmafîyê rû bi rû bûye, emrazên terorê bi kar tînin. Terorîst li Kurdistanê de dijî hêz û deshilatekê kiryarên terorîstî encam didin ku dijî pelçiqandinê û zilm û destdirêjiyê bo ser neteweya xwe ne, naxwazin ku hêz û deshilata Kurdî, bibe biçûktirîn bê hurmetî û bê mafî û ne edaletî ji bo çî ol û netewe û welatên dinê. Di



Terora Hewlêrê Kurdistan hejand

rastî de xelkê Kurdistanê û Hukûmeta Herêmê li ber çî û ji bo çî bûn bi armanca terorîzmê û nirxa kîjan tawanê didin? Tawana hevalbendî tevî wan hêzên biyanî ku dîktatorekî mirovkuj li hember Kurdan û Îraqîyan ji ustiyê wan ve kirin? Tawana pêçeçandin li ser bi dest ve anîna çarenivîsa xwe li ser bingehê dadperwerane? Tawana cehd û xebitîn ji bo vê hindê ku dixwazin war û nîştimana xwe pêka rê û cih û bingehên demokrasî û mafên mirovan birêve bibin? Tawana vê hindê ku naxwazin Kurdistana wan bibe cehenemek mîna Efxanistana Talîban û Îrana Melayan?!

Sedemekî din ji bo têgehîştina herî nizim û bê sinc bûna terorîstên dijî Kurdistanê eve ye ku di kincên pîroz û bi navê ol û "Ferîze"ya olî ve, cinayetên herî şermîn û dijî mirovî û hovane bi dijî xelkê û civakekê ku bi rastî rêz û hurmetê ji olê digirin û, rast di dema pêşwazî kirin û kelekela cejn û

hilkeftên olî de, encam didin. Bi rastî ji bo arxain bûn ji vê hindê ku ev cure sûçbarane çî firek bi ser çî olekî pîroz û mirovî ve nînin, her ev hinde bes e ku laşê ker-ker bûye wan zarokên xwendekar û wan kedkar û zehmetkêşane, ev jin û pîr û kalên bi temen, wan pêşmerge û polîs û karmendane bînin pêş çavên xwe ku di wan kiryarên xwekujî û êrîşên terorîstî ên vê dawiyê de, bêy vê hindê ku çî tawanek encam dabîn, bûne gorî. Eve çî mekteb û oleke ku peyama xwe ji rêya par-par kirina laşê mirovan li demên pîrozbahî ji hev kirin di cejnê olî de û bi sedema kuştina dehan kes ji qat û texên cur bi cur û birîndar û seqet kirina sedan kesan di çavleknanekê de, belav diket? Heke ev mekteb û ole û ev terze hizir kirine rojek ji rojan bi miraza xwe bighîje û deshilatekê bi destve bigire, cuda ji hovîti û tarîti û kuştinê, dikare çî diyariyêke din tevî xwe bîne?

Pirsekî dinê ku di pêwendî tevî kiryarên terorîstî ên vê dawiyê li Herêma Kurdistanê de cihê bal danê ye, eve ye ku, dijminatîya wan bi yek ji du Hukûmetên Herêmî yan du Partiyên mezine Kurdistanê nine. Ewan li her cihekê ku ji bo wan delîv pêk hatibe, Hewlêr, yan Silêmanî, Kerkûk û Helebçe, derba xwe weşandin e. Di wan cure êrîşane da merema wan tenê berpirsyarên hizbî û rayedarên hukûmetê nebûye, belkî kuştina her çiqas zêdetire xelkê û afirandina tirs û xofekî pitir di kiryarên xwe de ber çav girtin e. Eve jî cihê mêze kirinê ye ku zêde bûna teqîn û kiryarên terorîstî li Kurdistana bi zor bûna liv û xebitîna dewletên neyare Kurdan bo pêşî pêgirtin ji misoger bûna daxweza Federalî a xelkê Kurdistanê hevdem e. Her çiqas partî û qat û texên xelkê Kurdistanê refên xwe hevgirtir dikin û xwestik û daxwazên xwe li dor qedera Kurdistanê û gelê Kurd li Îraqa pêşerojê da bi hevdengiyekî zêdetir eşkeretir dikin, li derveyî sînorên Kurdistanê pîlan û kompiloyên dewletan û li hundirê Kurdistanê da, cinayetên terorîstî, zêdetir dibin. Ev rastiya han jî hekî nede selmandin ku ev terorîstane kirêgirtiyê dewletên dijî Kurda, dide selmandin ku dijminatîya wan bo gihîştina gelê Kurd bi maf û azadiyên xwe û nigeraniya wan ji misoger bûna jiyaneke rihet û tenahî di bin sîbera deshilata Kurdî da, ji dijberî kirina dewletên mîna Îran û Tirkiye û Sûriyê kêmtir **nine**

Doma rûpelê 7

û, hemû wekhev daxwezkarê bêparî û bindestiya heta hetaye gelê Kurd in.

Ev çende dide eyanê ku evên çavê wan bi dîtina Kurdistanekî azad û avadan bilind nabe, çi qas zor in û tenê rêya pûç kirina xwest û meremên mirare dujmin û neyarên Kurdan, hevgirtina refên xelkê herêma Kurdistanê û alîkarî kirina berpirsyanane ye wan tevî hêz û saziyên siyasî bi taybet YNK û PDK'ê û parastina deskevten vî gelf ji rêya yek xistina mala Kurdan û ji nav birina kêmasiyê wan e.

Encam dana vê kiriyara terorîstan ya vê dawiyê li roja cejna Qurbanê di Kurdistanê de, bir anîna weşandina derbekî dinê ye terorîzmê ji gelê Kurd e.

14 salan berî niha rejîma terorîstiyê Komara Islamî êvriya roja pêş cejna Qurbanê Dr. Qasimlo, rêberê jêhate gelê Kurd û Sekreterê Giştî yê PDK Îrenê ji me standin. Cihê xwe ye ku du carî bûna kiriyarên terorîstî li dijî gelê Kurd di cejna Qurbanê da, ji du aliyan ve bala aliyên deshilatdar li Kurdistana Îraqê bo aliyê pîlanên rejîma terorîstî û dijî Kurde Komara Islamî radkêşin e.

Ev rejîme ne her ji ber vê ku makeya mifah wergirtin ji terorîzmê bi navê "Ellah" û "Quran"ê li cejn û hilkvên olî de ye, ji ber ku derheq bi dijberiya kevn û eşkereye xwe tevî azadiya gelê Kurd û seba hewl û cehd kirin ji bo têkdana vê delîva ku ji bo Kurdan li Îraqê de hatiye holê dibe bi çavên dijmin û yekem berguman di wan kiriyarên terorîstî da, bihê mêze kirin.

Aliyên berpirsyan û karbidestên Kurdistana Îraqê ku bi rastî nigeranê geş û xurt bûna terorîzmê li war û welatê xwe da ne, dibe mil bi milê hev, hemû bizav û xebatekî hewceye dinê û girîngîdan bi her hegerek heyî, Komara Islamî ji bîr nekin û ji vê hindê jî arxayîn bin ku ev rejîme di refa herî pêşe dijminên cigir bûna tenahî û hevgirtin û azadiyê di Kurdistana Îraqê de ye.

Bi hêviya vê ku di bin sîbera hevgirtina hukûmeta herîmê û ariyariya xelkê û hukûmetê da, rê û derfet ji terorîstan bihê standin û ji nav biçin. Em serexweşiyê ji serokatiya PDK û YNK'ê û malbatên goriyan, xelkê Hewlêrê û hemû xelkê Kurdistanê dikin û baştir bûna hindî zûtir ji birîndaran re bi hêvî dixwezî.

Şermezarî û rûreşî ji bo terorîstan û dijminên cigir bûna aştî û azadiyê li Kurdistanê.

Pêşeroja Komara Islamî di hember xebata azadîxwaziyê de

Di sala 1997'ê de dema ku gelên bindest û azadîxwazê Îranê ji bo herifandina rejîma dîktator a Paşayetiye, bi serhildanek berfireh û gorî kirina hezaran mirovên tîniyê azadiyê, hêvîxwaz bûn ku piştî dawî anîn bi temenê reş û bi gemare rejîma Şah, dê bigehine azadî û mafên miroviyê xwe. Lê mixabin me dît çengek yê paşvero bi mifah wergirtin ji çek û seha olî û xapandina xelkê Îranê, Melayan karî berê vê serhildana pîroz e dîrokî û xwîna wan hemû şehîdan bi talan bibin û bi dest danîn li ser deskevten şoreşê da, hemû ev hêvî û daxwazên ku xelkê dixwastin, bi avê da berdin.

Rejîma Melayan her ji destpêka deshilata biyome xwe de hetanî niha ku temenê vê di 25 saliyê de ye, dest bi şopandina siyasetekê kiriye ku li hêla hundirî û derweyî de bingeha wê li ser wan xalên sereke ên jêrîni hatiye darêtin.

Siyasetên navxweyî

Komara Isalmî
Tepeser kirina her cure dengekî azadîxwazî û gunehbar kirina şoreşger û azadîxwazan bi nav û niçikên weke: *Dijî şoreş, kirê girtiyên bîhaniyan, ji dîn (Ol) warî bûyî û ...*. Di bin bandora vê ramana hişke Melayan da sala 1980'ê Xumeynî yê rêber û Welîyê Feqîh li hember daxwazên berheq û neteweyîye gelê Kurd de Fetwaya "Cehad"ê ragehand û rêtina xwîna Kurdan û dest danîn li ser mal û namûsa Kurdan helal kir. Kuştin û bê ser û şûn kirina dehan rewşenbîr û rojnamevanên cudahizir ku kêmtirîn lome û nerazî bûna xwe li hember siyaset û kiriyarên vê rejîmê eyan kirbûn û kuştina wan bi Kuştinên Rêzokî hate bi nav kirin. Xwe teyar kirin bi çekên rêpênedayîye komkuj û gefe kirin ji hemû mirovahî û jîngehê.

Siyasetên derveyî

Komara Islamî
Bi hêceta şandina şoreşa Islamî û çandina tovê vê şoreşê li hemû cîhanê, dest tewardan li kar û barên hunduriye welatan û pêk anîn û piştgirî kirin ji girûpên tundrê ên Islamî, pêk anîn û piştgirî kirin ji girûpên terorîstî û cî bi cî kirina kiriyarên terorîstî dijberî xelkê bêguneh û rikeberên rejîmê li welatên cur bi cure cîhanê ku wan kiriyarên han bi navê *"Emelyatên şehadet telebane"* bi nav diket, dagîr kirina Balwêzxwana Amerîka û şerê tevî Îraqê û dijberiya tevî Îsrayîl û ... ku malwêranî û ziyaneke zafe canî û madî gihande xelkê bê gunehê Îranê, ewane parek ji wan siyasetên derweyî ên vê rejîmê ne ku di heyamê 25 sal temenê reşe xwe da rêve biriyê û rêve dibet.

Ger çî rêberên vê rejîmê cehd

Mihemed Salih Qadirî

kirine bi dirûşma *"Got û bêjên jiyaran"* raya giştîye cîhanê bilêbinin û reng û rûmetek demokratîk bi vê rejîmê bidin, lê di eynî dem de di hundirî welat da bi egera kiriyarên hovane weke: Îdam kirina azadîxwazan û girtin û hepsî kirina xwendkar û rikeberan û bînpê kirina mafê mirovan bi giştî û mafên jinan bi taybetî û ... dirêjîyê didete deshilata dîktatorane ya xwe.

Encam

Eva cihê dilxweşiyê ewe ye ku xelkê zor baş kakila vê rejîmê nas kirine û bi hişyarî û zanebûna xwe êdî bi îdeolojiya hişke şoreşa bi nav Islamî nahên lêbandin û li ser vê bawerê ne, heta dema ku dîktatoriya Welayeta Mutleqa a Feqîh li ser hukim be, azadî, mafên mirovan, zagon û ... di Îranê de vê mihal û bê wate bin. Dizanin ku di vê sistemê da îradeya civatên xelkê çî biha û girîngiyek nine û hewceye ji bo xwedî derketin ji îrade û azadiya mafên xwe, ceħda herifandina vê rejîmê bidin.

Gelên Îranê bi xwaticem bûn ji vê rastiyê ku eger her diyarokek nekarbe xwe nû biket û ji pêvajoya geşe kirin û pêşkevîne raweste, êdî hebûna wê namîne. Bi dîtina wê qedera ku bi serê îdeolojiya hişke Yekîtiya Sovyetê û hevalbendên wê û Taliban li Efxanistan û Sedam li Îraqê de hat û gelek nimûneyên din, piştrast in ku ev rejîme jî vê bi rêya wan de biçît. Niha ku ev rejîme ji her aliyekê ve rastî genîtî û li dest dana meşrûiyeta xwe bûye û ji aliyê raya nevnaweweyî ve bi sedema bin pê kirina mafên mirovan û xwe teyar kirin bi çekên rê pê nedayîye komkuj ketiye ber givaş û baykot kirinê.

Bi taybetî piştî bûyera terorîstî a 11'ê Septembara 2001'ê, ku ev rejîme ji aliyê Amerîka ve bi tewera şeraretê hatiye bi nav kirin û ketiye nava eniya terorîzma navneteweyî.

Niha ku bizava berfirehe nerazî bûnê di Îranê de xew ji çavê rêberên rejîmê heram kirî ye û xîmê deshilata wan xistiye lertzîne.

Bi dîtina wan fakterên han û li ber ronahî û ceribandînen dîrokî ên sedsalên derbas bûyîye Îranê, em dibînin ku deshilatdarên dîktator e vî welatî çî carek bi hezkirina xelkê, bi rihetî ji deshilatê paşde newekîşyane û her tim ji aliyê xelkê ve bi serhildan û şoreşê hatine herifandin. Bo mînak: Şoreşa Meşrûte li sala 1905'ê de, Şoreşa Netewî kirina Petrolê bi serokatiya Dr. Mihemed Musedîq di sala 1950'ê de û Şoreşa herifandina rejîma Şah li sala 1979'ê de.

Ku wisan e vê carê jî gelên Îranê dibe bi bandor wergirtin ji wan guhartinên bi leze siyasî, aborî û civakî, ku li cîhana (sedsala 21)ê de tene pêş û bi dîtina wan fakterên ku li berahiyê da hatin bas kirin, hêvîdar bin ku pêşeroja xebata azadîxwazîya wan pir ronahî ye û hêviya serkevîne zaf nêzîk e.

Bizava Neteweyî a Kurdistanê li hember xwedîka guhartinên mezin

Ebdula Behramî

Bizava neteweyî a Kurdistanê Îranê li metoda xwe a nû de (metoda rêxistinî) hêdî-hêdî bi şeşemîn dehsala temenê xwe nêzîk dibe. Di şeş deheyên derbas bûyî de ku di wan de guhartinên mezin û berfireh li ser civaka cîhanî û Kurdistanê jî mîna meydana çalake vê bizavê hatiye, bi vî halî jî îro em dibînin evê bizavê ji bilî vê çendê ku kariye dirêjî bi temenê xwe bidet, belkî armanc û dirûşmên vê jî li hember tîrojka guhartinên serdem de geşbûnê mezin li xwe girtiye. Ewe rastiyeke ku ji rêya vê we em dikarin ji aliyekê pênaseya wê bikin û ji aliyek din ve pêdiviyên geş û xurt kirina zaftire vê bizavê di îro û pêşerojê de bi vê dest nîşan bikin.

Ji bo eyan kirina vê rastiya ku li serê îşare pê hat kirin pêwîst e ku yekem, avirdanek bilez bidin ser çawanî û pêwîstiyên ku vê bizavê anîne holê, duyem, kakil û rêjeya armanc û dirûşmên bizavê û qasê lihevhatina wan tevî rastiyan qonaxên cuda-cuda ên vê heyama dirêj ku qala vê hate kirin, sêyem, ev destkevtên girîng ku niha bûne sermaye û bingehek bo berdewamiya vê bizavê:

Bizava neteweyî a Kurdistanê Îranê, ji aliyekê weke zaf ji bizavên neteweyî ên gelên bindest û bêpar kirî ji mafên neteweyî ên xwe û ji aliyekê din ve ew pêwîstiyên ku ji aliyê rêberiya bizavê ve ji bo nû kirin û pêşxistina civaka Kurdewarî di biyavên cuda-cuda ye vê de xuya dikirin, di bîçima bizavekî berevanker di hember dujmin û her wisan guhartinxwaz di qada neteweyî de hate holê. Li gor vê çendê û bi berçav girtina wan gavên vê bizavê ku li biyavên cuda-cuda de weke parastina ziman û çanda Kurdî, berxwedanî kirin li hember sîstemên paşverûye rêxistinên civakî û tîtalên kevnarperwerî di civakê de avêtine, nabe tenê bi bizavek berevankar bihê nasîn. Belkî ev bizave di nava xwe de bizavekî çandî, civakî û rewşenbîrî bûye û destkevtên vê biyavê jî ji bilî zeliqandina vê pênaseyê, bûne rabihoriyeke geş û bi şewq ku di

vê qonaxê de jî dê bikare hebûn û berdewamiya xwe li ser dabirêje.

Bizava neteweyî a Kurdistanê li asta armanc û siloganên stratijî ên xwe de jî xwediyê xasmaniyan nemaze bi xwe ye. Ev bizave her ji destpêkê ve bi komek armanc û stratijiyên sereke û nirxandî ve hebûna xwe di meydana siyasî a Kurdistanê de ragihand. Ev armanc û stratijî ên dest nîşan kirî ji bilî vê çendê ku li gor rastî ên serdem û pêwîstî ên civaka Kurdistanê û kavdanên dever û navneteweyî hatine darêtin û peyrew kirin, di kakil û qada mikanîzma bi rêve birin û piraktîze kirinê de jî hişyar û nû xwaz bûne, li dîtingeha pêşeroja wan de li bilî davî anîn bi zordariya netewî, rê û mikanîzmên Modernîze kirina civaka Kurdistanê jî hatiye berçav girtin. Demokratîze kirina civaka Îranê, û Kurdistanê Îranê çareseriyeye jêhat tevî rewş û dirûvê ji bo pirsgirêka neteweyî, cudahiya OI û îdeolojî ji siyasetê, pêk anîna civaka bajêrvanî û ... parek ji wan armanc û setratijî ên girîng in ku vê civakê ji xwe re dest nîşan kirine û niho dikare ji her demekê pitir tevî pêvajûya guhartinên cîhana pêşvero hev digirin. Ji bo zelal kirina pitire vê mijarê pêwîst e bi kurtî îşareyek bi du xalên zor berbiçav were kirin:

1. Bizava neteweyî a Kurdistanê Îranê kariye pênaseyeye zanistî û simcî ji wateyan dewlet, siyaset û qazancên neteweyî û her wisa partî û rêxistinên siyasî bi refên xwe ve bizeliqîne û li gor vê pênaseyê hevalbendiyê di navbera berjewendiya bizavên neteweyî di Kurdistanê Îranê û parçeyên dine Kurdistanê de pêk bîne.

2. Di ceribînên kurdeme desthilatdariyan xwe de ji bo zeliqandina mercên pêşkevtinxwazane ên xwe cehdeke berbiçav kiriye.

Her çend ev bizave zêdebarî vê çendê ku zaftir ji niv sede xebata berdewam û bixwîne xwe nekariye bigihîje armancên xwe ên destnîşankirî, mîna dawî anîn

bi zordariya neteweyî û pêk anîna kawdanek wisa ku xelkê Kurdistanê bikarin di vê de li ser qedera xwe biryarê bidin û şiyana xwe di pêxema geşe kirin û pêşxistina Kurdistanê bînin holê. Lê em dikarin bibêjin ku bizavê kariye di meydana dinê ên xebatê de deskeftên herî mezin bi dest ve bîne; xurt bûna hest û hişyariya neteweyî û seha nasnamexwazî û mafxwazî, geş û xurt kirina bizavên çandî û rewşenbîrî di Kurdistanê Îranê de parek ji wan biyavan pêk tîne ku em dikarin bandora xebata vê bizavê bi hêsanî bibînin.

Bi egera wan destkevtane ye ku îro em dibînin mijara bizava neteweyî a Kurdistanê bûye bêjeya yekem û serdeste civaka Kurdistanê û roj bi roj zaftir û mil bi milê pêşkevtina çandî û civakî di Kurdistanê de ber bi pêş diçe û berfirehî û panatiya vê mijarê jî roj bi rojê li mezin bûn û pel avêtinê de ye û di hember da jî gotarên rê warîker û meh bûyî berew çilmisîn û qirax ketina hindî zêdetir diçe, ku wisan dibe bi bal dan bi wan xalên ku me li serê de êxistine ber çav, em dikarin bibêjin ku îro li ber xwedîka guhartin û rastiyan vî serdemî de bizava neteweyîye Kurdistanê mîna karakterekî pêşverûxwez û xwedî ceribandin di biyavên cur bi cur de, bûye desmayeyek mezin bo niho û pêşeroja Kurdistanê Îranê û li gor vê jî civatên xelkê Kurdistanê bi çavê hevî û evîne mêze dikin û paşeroja xwe û welatê xwe di armancên vê de dibînin. Hemî ev xalên erênî ku seba pênasîn û destkevtên bizava neteweyî a Kurdistanê Îranê ku li serê de hatine bas kirin, tevî vê çendê ku cihê şanaziyê ne, lê her di wî halî de vê erk û wezîfeyê dêxîne ser milê hemû xebatkarên nava vê bizavê ku ji bo xurt kirina hindî zaftire xebatê û destnîşan kirina wan xalên erênî bixebitin û bo ji nav birina kêmasiyan zaftir bixebitin û rêya gihîştin bi armanc û hêviyan gel xwestir biken.

Neteweya Kurd zêdetir ji sedsala ye ku bo gihîştin bi mafê xwe ên neteweyî, ku bi destve anîna mafê qederê ye, di xebatekî xwînavî û ne beramber de ye û bi hezaran qorî pêşkêşî vê rêya pîroz kirine. Xebata Kurdan di destpêkê de di bin bandora serok Eşîret û Serokên Olî de bû, ku yan bi merema berevanî û xurt kirina deshilatên xwe, yan jî li ber hêrs û tolstandinê, yan jî di pêxema hin destûrên olî de, agirê xebat û têkoşînê hilkiribûn, her çend ku piştî piraniya wan tevgerane form û reng û rûyeke neteweyî bi xwe girtin û armancên wan bo astê Kurdîtiyê jî bilind dibûn, lê destpêk û metodên wan bi giştî li ser bingeha çand û ramana Ostoreyî de hatibûne darêtin.

Ostore taybet bi hizr û ramana esmanî ye û taybet bi wî çax û serdemî ye ku mirov ji bo peçavtina bûyer û guherînên cîhanî, xurist û civakê hawar û gaziya xwe bo xwedayan dibirin, di serdemê Ostoreyî de her bûyereke ku çareseriyê wê di deshilata mirovan de çî neba sedema vê dibirine ser xwestik û daxwaza xudayan, lê piştî hatine xara raman ji esman ve bo erdî, Ostoran hêdfî hêdfî rewatiya xwe ji dest dan û deshilata hizr û ramanan kete destê felsefe û zanistê de. Ev guhertine her li serdemê Eflaton û Erosto li Ewropayê de dest pê dîke û bi domandina dîrokekê di geş û xurt bûnê de bûye û hetanî vî serdemî ku modernîzm wekî tewera bawer û hizrên mirovî di bilindtirîn û berçavtirîn qasê xwe de tê rojevê. Di Kurdistanê de jî ev guhertine dikeve nav mala bizava rizgarîxwazê Kurdistanê û bingeh û metoda wan bizavane ji bo rêvebirina xebatê ji xwe digire.

Her çende ku ev piroseye ji mêje li Ewropayê dest pê kiriye, lê mixabin niha jî di Kurdistanê de naveroka xebatê girêdayî bi bawerên kevneşopî ve ye û niha jî serdemê Ostoreyî jê nehatiye bazdan û qonaxa kevneşopî jî bi tewawî nebihorandî ye. Kurd niha jî bo domandina xebat û gihîştin bi armancên siyasiye xwe ji amrazên sunetî û Ostoreyî mifahê werdigirin.

Her wekî me îşare pê kir di destpêkê de me ji bo rêve birina xebatê li çarçoveya Hoz û Eşîretî û kevneşopiyê mifah werdigirt, lê nêzik bi 60 salaye ku me bi kiryar gav avêtine nava qonaxekî nûjen û bi partî bûnê de, lê ev gavên me ji ber vê ku tevî guhertinên din mîna:

Bizava Kurdî di bin bandora ramana Ostoreyî de

Rambod Lutfîpûr

Civak, Raman, Aborî û ... hevdem nebûn û piraniya partî û rêxistinên Kurdî di program û kiryarên xwe de carna ji metodên Ostoreyî û kevneşopî pêrewî dikirin.

Em niha li qonaxa bihorandina kevneşopiyê ji bo modernîzmê ne, di çaxekê de ku em mijûlê ceribandina cîhana nû û zanistî ne, hêj jî bi tewawî ji Ostore û kevneşopiyê cuda nebûne.

Civaka Kurdî di warê siyasî û xebata rizgarîxwazane de niha li pêk anîna hizrekî zanistî û berhem anîna awayekî nû, zor serkeftî nebû ye, niha jî zaf caran hatiye dîtin ku mîr maqûlekî Eşîretî, olî yan neteweyî wekî serok û rizgarkerê Kurdan hatiye bi nav kirin û deshilatekî zor û bê sînor jêre hatiye dan, ku hêvî û armancên wî bûne hêvî û armancên neteweyî, bi awayekê ku serok kariye biryarê li ser çarenivîsa gel û rêbaza tevgerê bidet. Her bi vê sebebê zaf caran rewşenbîr û hêzên pêşverû yê Kurd nekarîne ji ber hesûdî û pawanxwaziya wan rêveber û serok Eşîretane hêz û şiyana xwe di xizmet xebat û tevgera neteweya xwe de danên. Diyare sedema vê pîrsê li Kurdistanê de dizivire bo ser hin sebebên mîna:

1. Hilkevîna Kurdistanê di Rojhilatê de, ku bûye sedema hizr û baweriyekî Rojhilatî ku bingehê dîktatorî û esmanî heye, û nehêla ye felsefeya siyasî ji bo şirove kirin û berhevdana sîstemên siyasî yê cur bi cur geş û xurt bibe.

2. Kêm bûn yan nebûna çandekî rexnegirane û devokêkî rexnegir di civaka Kurdî de, ku şiyana pêk anîna bizavekî hizrî û pêşkeftinxwaz hebe. Dîroka axaftina diyalktikî li Rojavayê de dizivire bo serdemê Soqrat û bi giştî di heyamê 2500 salên berê ku ramana kilasîk ya Yûnanê pêk hat, heya îro jî her di berdewamî û xurtbûnê de ye. Di dîroka raman û hizra Rojhilatê de zor lawaz û xwedî dîrokekî kêm e, yan jî hêj pê negihîştîye û heke jî pê gihîştîbe di destpêk û qonaxa ceribandîna

nirxandinê de ye. Nebûna devoka rexnegir di civaka Kurdî de yek ji sedemên bingehîne pêk anîna kesayetiyekî karîzma û taboyî ye. Di her civakekê de ku derê rexnan hate daxistin rê ji bo geş û xurt bûna sîstemên pawanxwazî û dîktator xweş dibe, û di rewş û zirûfekî wiha de, neteweya karîzmaperwer ku bawerî bi xwe nînin, yan jî têgihîştina wan di astekî nizim de ye, bi tenê rêya guherîn û berevanî ji mafên xwe di qeware û çarçoveya serokekî karîzma û pîroz de dibînin ku ev rêveber jî bi her şaşiyekê, (ji ber nebûna rexne û gazîndeyan) qonaxek ji bizava wê neteweyê ber bi neman û têkçûnê pal dide.

3. Bêçareyî û nizim bûna saykolojiya neteweya Kurd.

Şikan û têkçûnên yek li pey yeke Kurdan di warê siyasî û xebata rizgarîxwazane de ku parek ji vê dizivire bo ser hawar birin ji bo karîzmayan û mezin kirin û heya qasekê jî rizgarker û Ostore, wisan ji mirovên Kurd kirî ye, ku bawer bi şiyana û hêza xwe nemaye û bi hêviya serhildana kesayetiyê, qehreman û rizgarker e, her bi vê sedemê hemû hêvî û armancên xwe di wî kesayetiyê de dibînin û di rûmet û reng û rûyê vî de azadî, rizgarî, bextewerî û serxwebûnê dibînin. Lewre ev gelê ku hêz û hêviyên vî ber bi lawaziyê çûbin bi neçarî bi çavê hêviyê pena dibirine ber qehremanan û karîzma û tabo ji wan diafirîn in. Hawar û gazî birin ji bo kesayetiyên karîzma û qehreman û bi giştî çêkirin û afiradina wan cure kesayetiyane ji xasmaniyan serdemê Ostoreyî ye û keresteyê xebat û têkoşînê ji bo serbestiyê ye ku taybet bi cîhana kevn û sunetî ye, mirov di cîhana nû ji bo çareseriyê asteng û girêpêçkên xwe, xwe berpîrsyar dizane û di sîstemekî organîkî de rol û nexşê xwe dibîne, bi mifah wergirtin ji eqlaniyeteke rexnegir zêrevanî ji pîrs û dozên civaka xwe û pêvajûya bizav û rêvebiriya bizava rizgarîxwaz a xwe dike.

Haydana xebata rizgarîxwazane ya gelê Kurd ber bi metodekî nûjentir û tevgerekî kêrhatîtir tevî rewş û zirûfa serdem û xwe girênedan bi şiyana û karîna serokekî taybetî yek ji mercên destpêkiye ava kirina civakekî nû û derbas bûn ji qonaxêke Ostoreyî di warê siyasî û xebata rizgarîxwazane de ye.

Demokrasî, biha û piraktîka wê

Beşa 1.

Kurmanc Hakkî

Bi salan e dirûşma stîratêjiye Partiya Demokrat a Kurdîstana Îranê Demokrasî wek hîlbijartinek herî baş ji bo civaka Îranê û Kurdistanê hatiye diyarî kirin. Îro pêvajoya demokrasî û civaka demoratîk ne tenê bûye dirûşm û daxwaza hemû bizavên opozosyon ên navxweyî û dereveyiye Îranê, belkî gelek rêxistin û partên dine Kurdistanê ên parçên din demokrasî wek sistemek herî îdeal didin xuya kirin. Ji bilî Kurdistanê pêvajoya han li seranserê Rojhelata Navîn xasmanî dîv şerê Îraqê û hilweşana rejîma Seddam bûye piroseyek mezin û rewtek binirx dijî sistemên totalîter û dîktatorên deverê.

Komara Islami jî xwe bi curek ji demokrasîya Islami dide nasandin ku tê de nirx û bihayên olî a Îslamê tîn berçav kirin. Li rastî de komara Islamiye Îranê xwe ji baştirîn demokrasiyên cîhanê dide nas kirin.

Gelo demokrasî çî wek pêvajoyê û çî wek sistema siyasî bi çî wateyekê tê? Merema me wek Partiya Demokrat a Kurdîstana Îranê jî demokrasiyê çîye. Em nirx û bihaya demokrasiyê li çî de dibînin û li piraktî de bi çî awayekê em dixwazibin demokrasiyê li welatê xwe de çî bi çî bikin?

Hetanî niha nirx û bihayên demokrasiyê bi awayekî wekirî çî li nav sinûrên partiyê de û çî li derevey sinûrên Partê de nehatine rohn û şirove kirin. Gelek li part û sazîyên Kurdistanê yên ku basa demokrasiyê û sistemên demoratîk dikin, çawaniya dîtingeha xwe ji demokrasiyê şirove nakin û demokrasî tenê wek modek li basên siyasî tê bikar anîn.

Demokrasî wek remza despêkiya bihayên partiya me, garantî a saxlemî û geşe kirina civaka Kurdistanê tê ditin, lewma nasandina Demokrasîya ku hizba me ji bo damezrandin û misoger kirina wê xebat dike,

pirsek rojeviye û her di wê demê de jî wê cudahiya me digel hizr û ramanên dine ser demokrasiyê rohn diket.

Demokrasîya ku partiya me dixwaze tenê armanca wê saz kirina hîlbijartinên azad nîne, hîlbijartinên azad yek ji wan armanca ne ye ku partiya me bo sistema demokratîka pêşrojê hîlbijartiye. Edaleta civakî, pêk anîna civakek modern û zanistî, ku tede mirov bibe xwediyê zanist û biryar û hîlbijartina xwe, ew nirx û bihayane ku partiya me bo sistema pêşrojê berçav digire.

Îro pêvajoya demokrasî û civaka demoratîk ne tenê bûye dirûşm û daxwaza hemû bizavên opozosyon ên navxweyî û dereveyiye Îranê, belkî gelek rêxistin û partên dine Kurdistanê ên parçên din demokrasî wek sistemek herî îdeal didin xuya kirin

Xuyaye wek parteke endamê Înternasyonala Sosyalîst û wek mîratgirên rêbaza Qasimloyê nemir erka me pêk anîna mekanîzma civakek bihêz û xwedî strûktore. Lewma ji bo nas kirina partiya me û ji bo vekirina demokrasiyê em di zincîre gotarên xwe de vê bihevîlînin kurtiyek li dîrok, bîr û raman û şewazên demokrasiyê bi xwandevevanên xwe bidin nasandin û li dûmahiyê de jî ew demokrasîya ku partiya me dixwaze bi awayekî wekirî bêxin ber basê.

Pêşbas

Demokrasî li asteka cîhanî wek pêvajoyek bi awayek pozîtîv hatiye wergirtin û her dewletek jî basa cura demokrasîya xwe dike. Xasmanî piştî şerê dîyeme cîhanî (1941 - 45) demokrasî bi wateya **başî** hatiye mana kirin. Di nîqaşên devokî û nav xelkê de demokrasî



wek wateyek hatiye şirove kirin, ku tê de bo nimûne civak li ser bîngêhên adilane, wekheviya hevvelatîyan û mafê hîlbijartina cura jîyanê bo mirov hatiye wate kirin. Demokrasî her wisa bo gelek partî û rêxistin û dewletên cîhanê wek armanca pêşerojê hatiye diyarî kirin. Demokrasî tiştek bi **biha** tê wate kirin.... Lê çima demokrasî?

Digel giştgir bûna pêvajoya demokrasiyê, manaya demokrasiyê jî hatiye şaşandin. Bo gelean cîhê pîrsyarê ye armanc li demokrasiyê çî cur sistemeka siyasîye?

Di roja îro de em dikaribin basa serdema sergêjiya demokrasiyê bikin. Parek jî wê sergêjiyê digere ser guhertinên cîhan û civaka mirovaniyê. Demokrasî îro bi awayek berîn wek pêvajoyek tê wate kirin, ku tê de mirov beşdariyê li hemû piroseyên civakî, ku pêwendî bi qedera mirov ve hebe dike û bi awayek *kollektîv*¹ biryar tîn dan. Wateya han bi awayek giştî ji bo pêwendiyên dewlet û deverên biçûke dewletî bikar hatiye birin. Di serdema me de piraniya biryaran li derevey sinûrên neteweyî wek Neteweyên Yekgirtî û Banka Cîhanî tîn dan ku rasterast kar dike ser şeweya jiyana mirov. Şewaza han her çend carê ne pîrsgirêka me ye, lê bi giştî li cîhanê bi awayek rexnegirane hatiye mêze kirin, ku tê de mirov mafê hîlbijartinê tune.

Demokrasî li aliyekê wek pêvajoyek şiroveyî (descriptive) hatiye dîtin û li aliyekê din jî wek sistemek normatîv (yasayî) ku tê de kar û barên civakî li ser bîngêhên yasayan tîn perjandin hatiye manakirin.

Di gotarên hijmarên tîn de mijara demokrasiyê dê hîna rohntir bihê kirin.

Têdîtin:

Ji bo vê nivîse em li pirtûka "Demokratian Arvo, teoriat, kâytännöt ja mahdollisuudet" ji nivîsandina profesora Maija Setälä, mamostaya zankoya Helsinki li Finlandê wek serekaniya despêkî behrê wer bigirin.

¹ Collective

Hevdîtinên Sekreterê Giştiye Partiyê li Îngilistanê

Birêz Ebdula Hesenzade, Sekreterê Giştiye Partiyê, ku bo sefereke çar rojî (yekem hetanî çarê Februariya 2004'ê), çû bû Îngilistanê û dema ku gihîste paytextê wî welatî, ji aliyê endamên Komîteya Partiya me di Îngilistanê de, bi germî hate pêşwazî kirin. Sekreterê Partiyê di van çar rojan de, serbarê hevdîtin di gel endam û tagirên partî û hejmarek ji kesatiyên Kurd û Îranîyên akinciyê wî welatî, tevî kesatiyên xwarê jî guhartina bîr û rayan kir:

Birêz Tam Kılark nonerê Parleman û serokê Girûpa Alîgirî ji Kurdên Îraqê li Parlemana Îngilistanê.

Di vê rûniştinê de ku di parlemana wî welatî de bi rêve çû, her du aliyan tevî kêyfxweş bûna xwe ji vê hevdîtinê, derheq bi rewşa devera Rojhelata Navîn, Îran û Kurdistan, bîr û rayên xwe guhartin.

Birêz Ebdula Hesenzade, tevî rêz û hurmet ji têkoşîna birêz "Tom Clark" û girûpa wî derheq bi tagirî kirin ji mafên rewşa û berheqê Kurdên Îraqê, rewşa aloz û xirab li Îranê, çeqîna bi nav "Refurmîstên hukûmetî" û xwest û daxwaz û biryara piraniya xelkê Îranê di peywendî tevî guherîna rejîmê de axivî.

Sekreterê Partiyê îşare bi nexş û rola gelê Kurd li Kurdistanê Îranê bi rêveberiya PDK Îranê û bizava rizgarîxwazaneya xelkê Îranê kir û bi baldan bi xebat û berxwedaniya çendîn saliye tevgera Kurd li Kurdistanê Îranê, nexş û rolê vê bizavê bibandor û girîng hesaband.

Birêz Tom Clark, kêfxweşiya xwe ji vê hevdîtinê anî ziman û her wisa ji ber van dîtin û hizr û ramanên ron ku derheq bi deverê û bi taybetî li ser Irene hebû sipasiya

Sekreterê Partiya me kir. Ev hevdîtine ku roja sêşemiyê berwarê 03.02.2004'ê, demjimêr 11:30'ê hate encam dan, demjimêrekê dom kir.

Birêz "Lord Êvîbirî", nonerê Meclîsa Lordên Îngilistanê û serokê gurûpa Parlemanê a berevanî ji mafên mirovan

Ev hevdîtine ku demjimêr 4:15'ê piştînivroya vê rojê, anku sêşemiyê di Meclîsa Lordên wî welatî de hate encam dan, demjimêr û nîvekê domand û têda li ser komêk pirsên cur bi cur e deverî, ji van rewşa Îraq û Kurdistanê Îraqê û bi taybet rewşa Îran û Kurdistanê Îranê bîr û rayên xwe guhartin.

Birêz Mamosta bi şirove û ron kirin li ser wan warên ku hatin bas kirin, li ser girîngiya hevkarî û alîgiriya kesatiyên demokrasîxwaz ji xebat û têkoşîna gelên Îranê, ji wan gelê Kurd li Kurdistanê Îranê, di pêxem bi ser kar anîne rejîmeke demokratîk di welatê me de, tekez kir.

Birêz "Sitan Niyonz" Serokê Partiya Azadî (Liberation)

Rûniştin tevî birêz "Stan Niyonz" demjimêr 10'ê sipêdeya roja çarşemî berwar 04.02.2004'ê, li mala birêz Niyonz hate encam dan.

Birêz Niyonz ku ji hevalên kevnare parta me û bi taybet dost û hevalê nîzikê şehîd Dr.Qasimlo ye, tevî pêşwazî kirina germ ji rêzdar Hesenzade, ji ber vê ku daxwaza navbirî pejirandiyê û çûye mala wî, pir bidil sipasî jê kir.

Di vê rûniştina germ û hevalane de, her du aliyan derheq bi rewşa Îran û Kurdistanê Îranê bîr û rayên xwe gohartin. Birêz Niyonz ku pûte û bihagiranî bi pirsên Îran û Kurd di Rojhelata Navîn de dide û bi hogiriyeke taybetî ve ji dûv wan dikeve, şirove û ronkirinên



Birêz Ebdula Hesenzade, di sefera xwe ya bo welatê Îngilistanê derheq rewşa devera Rojhelata Navîn, Îran û Kurdistanê bi çend kesatiyê siyasî re hevdîtin kir.

Sekreterê Partiya me di vê derheqê de bi mifah û girîng hesaband û li ser piştîvanî û tagiriya parta xwe ji xebata gelên Îranê û bi taybet gelê Kurd tekez kir.

Birêz "Luis Eyala" Sekreterê Giştî ye Entirnasyonala Sosyalîst.

Ev hevdîtine demjimêr 4'ê piştînivroya roja çarşemî (40.02.2004) li debîrxaneya Entirnasyonala Sosyalîst di Londonê de hate encam dan. Di vê hevdîtinê de serbarê bîr û ra derbirîn derheq bi rewş û kawdan li Îran û Kurdistanê Îranê û bi giştî deverê, xebat û têkoşîna xelkê Îranê di pêxema bi destve anîna demokrasî, azadî û anîne ser kara sistemeke demokratîk axivîn û çalakîyên Gurûpa Karê Entirnasyonala sosyalîst di peywendî tevî pirsê Kurdan vekoland in. Birêz Eyala, di vê hevdîtinê de, serbarê pê çeqandin li ser tagiriya Entirnasyonala Sosyalîst ji xwest û daxwezên rewşa û berheqê gelê Kurd û bi taybet Kurdên Îranê, ev hevdîtine gelek bi mifah zanî û berhevdana Partiya me derheq rewşa Îranê birast û durist hesaband.

Hejî gotinê ye ku di hemû wan hevdîtinan de, birêz Dr. Xusro Ebdulahî, nonerê Partiyê li derveyî welat û Mewlûd Siware, berpirsyarê Komîteyê û nonerê Partiyê li Îngilistanê Sekreterê Partiyê hevrêti dikirin.

Nûçeyên Kurdistanê

Sine

Roja 15.11.1382'ye Rojî, Tankêreke hilgirê mewada jehrî kete nav yek ji Çemên avbenda Qışlaxê û ajovanê wê tankêrê jî bi silametî der çû, her çend rayedarên rejîmê gotine ku ev Tankêre hilgirê Pûdra "Nûşab"ê bû ye, lê belê karnasan ragehandin ku ev Tankêre hilgirê mewada jehrî bûye û dîsan têkilî ava avbendê bûye. Ev ava ku xelkê bajarê Sine bo vexarinê mifahê jê werdigirin.

Rayedarên bajêrvaniya parêzgeha Kurdistanê di yek ji civînên xwe de, îtiraf bi vê hindê kirine ku ev mewade jehrî bûye, lê belê gotine ku ev jehre zor cihê tirsê nîne.

Xwenîşandan dijberî Komara Islamî

Sine

Xwandikaran meşa li darxistî ya ji aliyê rejîmê ve têk dan

Raja 22'ê Rêbendanê di demekê da ku pêka bernameya rejîmê ku xwendekar ji bo meşekê di vê rojê de dihatine berhev kirin, nişkêve hemû xwandikaran dirûşmên dijî rejîmê û **Bijî Kurdistanê** dan. Bi wî terzî Kontirola meşê ji destê rayedarên rejîmê derket û meş jî têk çû. Piştî çar rojan çend memûrên rejîmê rijiyane nava xwendingehan û çend kes ji xwandenkarên van xwendingehane girtin û hepsî kirin.

Merîwan

Raja şemiyê 25.11.1382'e Rojî, xelkê bajarê Merîwanê seba heftemîn gera hîlbijartina Meclisa Şewra Islamî, li hember "sitad" a berendamên wî bajarî da, meşeke nerazî bûnê lidar xistin û rê nedane tu kesekî helperest bi navê xelkê Merîwanê biçîte ser Kursiya Meclisê û xizmetê bi rejîma Komara Islamî biket.

Ciwanro

Raja 22.11.1382'e Rojî zêdetir ji 5000 kes ji xelkê bajarê Ciwanro û herêmên ser bi wî bajarî li navenda vî bajêrî da civiyan. Memûrên êstixbarat (îtilaat)ê bi lez xwe gehandine cihê civînê û bi xwenîşanderan ragehandin ku bi

mercekê dikarin vê meşê bidomînin ku piştgirî ji rejîmê hebît. Lê belê xwenîşanderan bi gazinde ji wê daxwazê dirûşmên dijî bi rejîmê avêtin û dirêjî bi meşa dijî Komara Islamî dan. Di vê meşê da xelkê bi dirûşmên **"mirin bo rejîma Komara Islamî"** û **"mirin û neman bo dujminên Kurdan"**, vêzariya xwe ji rejîmê dane eyan kirin. Hêzên rejîmê li dijîkiryarên derheq bi wan dirûşmanê û vê meşa nerazî bûnê, êrîş kirine ser xwepêşanderan, lê belê ew êrîşê jî tevî dijîkiryarên xelkê berengar bû û di encam de çend tirombêlên hêzên rejîmê hatine şevitandin û çend tirombêl jî ji kar êxistin. Piştî hingê xwenîşanderan êrîş kirine ser banka Besic ya Sipahê li Ciwanro û zerer û ziyaneke zor gehande wî bankî. Her di dirêjiya wê meşa nerazî bûnê de dermanxaneyê "Lylani" ku kavilkoka Sîxor û kirêgirtên rejîmê û navenda belav kirina Nikotînê ye kete ber êrîşa xelkê nerazî û ziyaneke zef jî pê gihîşt.

Bi berfireh bûna vê meşa nerazî bûnê, Pasgeha hêzên rejîmê kete ber êrîşa xelkê. Hêzên rejîmê ku delîva berevaniyê li hember xwenîşanderan de tune bûn, penaha xwe bo çend kesayetiyan wî bajêrî birin, hetanî ku xelkê bi dawî anîna vê meşa nerazî bûnê razî bikin. Hejîyê gotinê ye ku ev xwenîşandane hetanî bere berê sipêdehiya roja 23.11.1382'e Rojî dom kir. Pêka nûçeyê gihîştî ji bajarê Ciwanroyê, 15 kes ji xortên wî bajêrî ji aliyê hêzên rejîmê di vê derheqê da hetine girtin û kirine girtîgehê de.

Korên behî û serexweşiyê ji bo şehîdên raja 1'ê February, li bajarên Kurdistanê de

Bokan

Roja îne 17'ê rêbendana 1382'e Rojî, Civata Wêjeyî a Bokanê bi sedema qewimîna roja 12'ê Rêbendanê li bajarê Hewlêrê û şehîd bûna komek ji mirovên şoreşvan û niştimanperwera Kurd, rê û resmeke behî û sersaxiyê di mizgefta Camie ya wî bajarî de pêk anî.

Hejî gotinê ye ku di wê taziyê de bi awayekî berbiçav ji rewşenbîr,

xelkê niştimanperwera Kurdistanê pişikdar bûn û her bi wê sedemê komek gotarên wêjeyî û gotarên cur bi cur hatin xwendin û di dawiyê de piraniya pişikdaran tevî wê ku ev kiriyara terorîstî şermezar kirin, hevxiyê xwe jî tevî kes û karên gorîyên vê bûyerê derikandin. Her wisan Civata Wêjeyî a bajarê Bokanê ku qirar bû di roja 2'ê Rêbendanê de rê û resmekê bi hilkefta 58'emîn salvegera ava bûna Komara Kurdistanê pêk bîne, piştî wê ku rayedar û berpirsyarên ewlekarî û dewletî ên rejîmê arîşe û pirsîgirêk anîne ser rêya wan, û nehêlan ew rê û resme di wî bajarî de bihête meşandin. Bi berdevam bûna xwe di cehda dûvde çûna roja 7'ê Rêbendanê rê û resmeke hêja û berfireh li cihê vê civatê lidar xistin.

Li vê rê û resma taybetî ku tê de bi dehan kes ji rewşenbîr, helbestvan, nivîskar û ciwanên niştimanperwera bajarê Bokanê pişikdar bûn, komek gotarên zanistî li ser vê roja dîrokî hatin xwandin û her wiha ciwanên helbestvan û şaire wî bajarî bi pêşkêş kirina helbestên neteweyî û niştimanî, reng û rûy (siroşt)ekî taybetî û bedew bi wê rê û resmê bexşin.

Merîwan

Roja şemî, 18 ê Rêbendan a 1382 e Rojî, korekî behî û serexweşiyê bi sedema bûyera daxbare bajarê Hewlêrê ji aliyê xelkê niştimanperwera bajarê Merîwanê ve hate li dar xistin, di wê kurê de, serweyî wê ku xelkekî ber bi çav pişikdar bûn, komek gotarên edebî û çendîn gotarên Siyasî û netewî hatin xwendin û pişikdaran tevî şermezar kirina wê cinayet û bûyerê, hev xemî û hevsoziya xwe tevî kes û qar û aliyên Siyasiye Kurdistanê Iraqê derikandin.

Urmiye

Raja şemî 21'ê Rêbendana 1382'e Rojî, ji aliyê xelkê niştimanperwer û şoreşvane bajarê Urmiyê rê û resmeke behî û serxweşiyê bi egera bûyera terorîstî a bajarê Hewlêrê li mizgefta "Nûr" ya wî bajarî hate lidar xistin.

Di wê rê û resma daxbar de Kerîm Fetahpûr, nonerê Kurd li Meclisa Şewra Islamî, axavtinek bi vê egerê pêşkêş kir û her wiha piştî axavtina wî Mamosta Mela Riza gotarek pişkêş kir. Hejî gotinê ye ku pişikdaran rê û resmê bi tundî ev cinayete şermezar kirin û alfgirî û piştîvaniya xwe ji xwast û daxwazên rewa û berheq gelê Kurd di wê para Kurdistanê de, ragehandin.

Komara Islamî û doza mewada muxedir (narkotîk)ê

Dara Natiq

Yek ji mijarên herî çepel û malwêranker ku li serweyî dehan arîşe û girêpêçkên din berengarî gelên Îranê bûye û xof û tirsî zaf bo gelên Îranê û bi taybetî qata ciwanên welat çê kirî ye, Kirîn û firotin û bi kar anîna mewada muxedir e. Ev mijare di demê deshilatdariya Komara Islamî de bi terzekî bê wêne hatiye geşandin û hêdî hêdî di nava xelkê Îranê de zêdetir û xurttir dibît.

Îran di 25 salên derbas bûyî de yek ji rêya herî serekî a derbas bûna mewada muxedir ji kîşwera Asiya ve bo welatên Ewropayî bûye û bazerganiya vê mowadê jî yek ji çavkanî ên mezin yên dahata dezgehên sîxorî û terora rejîma Komara Islamî a Îranê bûye.

Piraniya herî zora vê mowadê ku ji welatên cîranê Îranê ve tete berhevkirin bi taybet tewahiya mewada ku li Efxanistanê da tê çandin, pişkek di nava Îranê de tê belav kirin û para din jî ji rêya sînorên rojavaya Îranê ve ber bi welatên Ewropayî tê şandin.

Her çend ku siyaseta fermî ya Komara Islamî bi serwekî dijberî kirin tevî tecareta mewada muxedir û pêşî girtin ji belav bûna vê mowadê di hundire Îranê de ye. Lê di rastî de eva aliyê eşkereye ve pirsêye û îro ev rastiye ji çî kesî re nahê weşartin ku ev rejîme mîna qaçaxçî ên mewada muxedir bazirganiyê bi vê mowadê diket û çavkaniya herî mezin bo misoger kirina pêdvî ên leşkerî, ên "serbazên" Imamî zeman û dezgehên sîxorî û terorîstî ye rejîmê li derve û hundirê welat de.

Zêdebarê rastî ên han, Komara Islamî bo lawaz kirina seha neteweyî û siyasî a xebatkare û ciwanên Kurd wê mowadê di nava

xelkê Kurdistanê de bi terzên cur bi cur û bi taybetî ji aliyê kirêgirtên xwe ve belav diket.

Siyaset û helwêsta Komara Islamî derheq kirin û mezaxtina mewda muxedir di seranserê Îranê de mîna hev nine. Eger Komara Islamî li bajar û herêmên nekurd wisan dide eyan kirin ku tevî qaçaxçî û torên belav kirina vê mowadê dijatiyê diket, mixabin li Kurdistanê ev pîrse bi terzekî dinê ye. Komara Islamî ne tenê pêşgiriye ji belav bûna vê belaya malwêranker naket belkî bi têkilî tevî kirêgirtî û organên tepeserkarên xwe, wê mewada pîs û malxirabker di nava ciwanên zulim jêkirye gelê me de belav diket.

Di vê pêwendiyê de bi hezaran kes ji ciwanên Kurd ji aliyê kirêgirtên rejîmê ve hatine lêbandin û piştî vê ku ev ciwanane tevî refên PDK Îranê bûne, ev rastiye dane eyan kirin û perde li ser siyasatên dijî gelî ên Komara Islamî hildane.

Hejyê gotinê ye ku berî bi desthilat gehîştina Komara Islamî mijara kirin û firotin û her wisan



Komara Islamî dixebite ku bi têkilî û tûş kirina xortên Kurd bi mewada muxedir, seha azadîxwazî di dilê wan de bimirîne û ji nav bibe

kêşana mewada muxedir di Kurdistanê û Îranê de bi terzekî gelek kêr dihate xuya kirin. Lê niha ne tinê li bajarê mezin belkî li herêm û gondên biçûk de jî ev mowade gelek bi hêsanî dest dikeve, radeya kesên muitad li çav salên berê çend beraber zêdetir bûye û gihîştîye qasekê ku xwangingeh jî bûne nawenda mezaxtin û belv kirina curên vê mowadê mîna **Giras, Heşîş û Hiroyînê**.

Eva ku li serê îşare pê hate kirin, eyankerê vê rastiye ye ku Komara Islamî bo ji nav birina gelê xebatkare me, li çî terze kiryarekî dijî mirovî xwe naporêz e. Di rastî de Komara Islamî ji

mêjve ye bi vê encamê gihîştîye ku ji nav birina seha azadî xwazî û netevî a gelê Kurd bi taybet di nava qata ciwanan de ku hêza sereke ya gelê Kurd in, siyaseta bingehîne vê rejîmê ye û cuda ji tepeser kirin û lêdan û girtina ciwanan, cehdeke mezin dike heta ku ciwanê Kurd têkil û girêda jî bi mewada muxedir biket ku mixabin di vê kiryara nemirovî de heta qasek serkeftî bû ye.

Komara Islamî baş ji vê rastiye agehdar e ku ciwanên Kurdistanê hêza herî serekî û xwragir a bizav û tevgera gelê Kurd in.

Lewma Komara Islamî dixebite ku bi têkilî û tûş kirina xortên Kurd bi mewada muxedir, seha azadîxwazî di dilê wan de bimirîne û ji nav bibe.

Ji bilî van jî ceribandin û vekolînên berê ev çende dane eyan kirinê ku kesên tûş bûyî bi mewada muxedir ji bo destve anîna vê mowadê amade ne dest bo her cure kiryarekî nemirovane bavêj in, heta hinek ji van mutadan ne tinê ji bo dest ve anîna vê mowadê pişt ji malbat û kes û karên xwe dikin, belkî dibine amraz û dar û desteyên rejîmê û pişt xwe ji gelê xwe jî dikin.

Rejîma Komara Islamî bo merem û kiryarên dijî mirovî yên xwe, ku yek ji wan ava kirina torên sîxorî û teror kirina xebatkare gelê me ye mifahekî zor ji wan kesan werdigire.

Rayedarên Komara Islamî di Kurdistanê da ne tinê mewada muxedir di nava xelkê Kurdistanê de belav dikin, belkî bi xwe jî tevî qaçaxçî û bazerganên vê mowadê û torên belav kirin û mezaxtina wan de pişikdar in û ew kare di bin çetra wan de tete cî bi cî kirin.

Belav kirina vê mowadê li herêmên Kurd akincî de gihîştîye qasekê ku heta li sînoran jî derbas bûye û niha kirêgirtên rejîmê, Kurdistanana Îraqê û Tirka jî xistine bin torên belav kirina mewada muxedir û bazerganiyê pê dikin.

Rejîm li rêya belav kirina vê mowadê li Kurdistanana Îraqê li dû meremên dijî gelî ên xwe di nava wê para Kurdistanê digere. Bêguman rêya rizgar kirina xelkê Îranê ji wan hemû rojreşî û girêpêçkan, xebat û têkoşîneke berdewam e ku bi merema ji nav birina Komara Islamî û vemaîna şunwarên biyome vê rejîmê, bête meşandin.

Siyamend Terbî

Ay evdalê ezê!

Di navenda bajar de gireke bilind hilkevîbû ku bi ser bajar de zal bû. Rojekê mîna hemû rojên pêşîn, xalê Simaîl malxê malê ji malê derketibû. Meta Gulê xêzana xalê Simayîl mijûlî kar û barê nav malê bû ku nişkêve dengê teqê bihîst. Demekê rawestiya û dîsan mijûl bû. Lê car bo carê dengê teqeyê zêde dibû û dengê wê bi ser hemû tiştêkê da zal dibû û qîrîn û dengê deng ji taxê Kurdistan bilind bû û xelk di nav hev du dilivlivîn. Meta Gulê derkete derê hewşê û bi hurî mîzeyî nav bajêr û derdoran kir. Dengê çekên nîve giran ku wekî Kundê biyom nûçeyek nexweş dida, bala Meta Gulê bo aliyê xwe rakişand û dît ku dengê wê çeka doşkayê li bilindiya girê nav bajêr tê û taxê Kurdistan dikuta, bi heçî desrêjyîkê toz û xubar ji malan dirabû. Meta Gulê matmayî ma ku eva çiyê û çima tê kirin? Du tep ji çekên xwe dan û got: "Way evdalê ezê, eva çî bû hat serê me" û çû jorê û zarok li devra xwe kom kirin û guhê xwe bi ser dinyayê dagirt. Şer tundtir dibû, dengê nalîn û hawara zarokan û lorandina dayîkan car bo carê bilindtir dibû. Girme girma çekên giran jî dest pê kir. Wê demê dengê dergehê malê hat û dilê Meta Gulê lerizî û wisan zanî ku Pasdar û Komîteçî bin. Lê bi anîna navê xwe, Gulê hindekê hate ser xwe û zanî kesek nasîyar e. Dergehê odayê vebû, Eliyê birayê Simaîl yê Pêşmerge bû. Gulê tevî wî kete axavtinê û pirsî:

- Herê ezîzu, eva çî bûye?
- Elî got: Jin bira!
- Pasdaran êrîş kirine ser Kurdistan û xelkê dikujin!

Meta Gulê dest avête dergûşa sava ye xwe û bi lez ji malê derçû. Nire nira tangan tevî teqe teqa tivingan gihîstibû nêzî mala Xalê Smaîl. Pêlên jin û zarok û kal û pîran li bajar derdiketin û hinek bi pêxwasî, hinek jî bi perîşanî mijûlê rizgar kirina canê xwe bûn. Di wê gavê de dergûşa Meta Gulê hat bîrê ku çî deng û livlivînek nîne. Demekê lêfe hilda wekî vê ku birûskêkê lêda be, li cihê xwe de hişik bû.

- Herê Gulê! Eve tu bo rawestayî, bilezîne Pasdar hatin!
- Lê Gulê her guhdarî ne kir.
- Elî li ser milê xwe zivirî û ji Gulê nihêrî û gazî kir:
- Dê bibez e! Zûb e!
- Gulê bi dengekî bilind ji kuratiya dilê xwe re qîrand û got:
- Elî zarokê min!

Eyan bû wî çaxê ku Gulê bilez û bitirs li odayê destê xwe di avêje pêçolka dergûşê, nebêje tenê lêfa wê hilaniye û bi vê hizrê ku zarok di nav lêfê de ye, di keve rê û nizane zarokê sava bi cî ma ye.

Evîna cergî zor giran bû. Her di wê demê de Gulê li cîda zivirî bo aliyê malê di nav şer de kete rê û Eliyê tiyê xwe bi cî hêla. Wekî Xezala dil birîndar û hinav sotî xwe ji der û diwaran da û gihîste ber dergehê malê û çû jorê. Mal şepirze bû. Şûndewsî Pasdaran di malê de diyar bû ku gelek tişt şikandibûn. Gulê li kuncê odayê nihêrî, zarokê sava û bê guneh di nav xwînê de sor bûyî dît û qîrand û pirça serê xwe werû û ser û çavên xwe renî. Dest avête dergoşê û wê carê tund li hembêz girt û li malê derket. Li ser kolanê tûşî tanga dijmin bû, tangê nirand û da ber guleyan. Lê Gulê karî bi çî halê heyî xwe rizgar biket.

Bi hatina Meta Gulê û anîna zarokê bê can, Elî pêçolka zarok wekir, di cihê xwe de hişik û matmayî ma. Çî dîmeneke tal û nexweş, hov û cinayetkarane bû. Karek ku tenê ji leşkerên Mixul û Tataran hatibû dîtin. Belê serê zarokê bê suç û sava ji aliyê **leşkerên Islam û Imamê Zeman** ve bi sernîze û qemê hatibû birin û dilop dilop xwîn ji helelûka wî dihate xwar.

Meta Gulê, dayîka dil birîndar û dil şewitî, dilorand û dar û ber diheland in û digot: Dayê, dayê, evdalê dayê, başe guneha te çî bû **gula sava!** Xwe hêj te çî fam ne kiriye **gula dadê!** Bo çî? Çima wan kafir û ne mirovan serê gula min birin, dayê? Xwe hêj gula min nebişkivî bû ku wan neyaran gula min ji reh de der anîn?! Ay kur bim bo te, çima guneha te çî bû ku wan nemirovan nehêlan tu bijî, bila agir bikeve mala wan zaliman û hêviya min ev e ku xêrê ji xwe nebînin.

Gotinên Mezinan

○.Hûr binêre, kûr binêre, dûr binêre.

○.Heçî bixwaze mala xwe bi destê xwe xirab biket, bila du jina bîne.

○.Heçî nezanît qaweta xwe, dûr e ji dewleta xwe.

○.Heta mirov ber pêyê xwe nebîne, nabe gavan bavêje.

○.Heta mar xwe rast neket, naçîte kunê da.

○.Doyê ceribandî, çêtire ji Mastê neceribandî.

○.Dar bi stûrî nabîte kopal.

○.Ger teyr biçîte ser erş, vê her danête ser axa reş.

○.Seyê xweyî lê heytrandî, xelkê ber tê firandî.

○.Dinya hemû dujminê Kevê ye, Kev jî neyarê xwe ye.

○.Heta min xwe nas kir, min emrê xwe xilas kir.

○.Ji ber xatirê xatira, xelk diçine ser dîne kafira.

○.Aqil tacek zêrîne, belê li serê hemû kesê da nîne.

○.Lêmiştê aş biribû, Aşewan ji çeq çeqê dipirsî.

○.Behir bi devê Se naherime.

○.Bedev mişen e, lê xwîn şirîn kit-kite ne.

○.Cer di rêya kaniyê da dişkê.

○.Dilê nazik nagehîte çî mirazan.

○.Her teyrek tewî refa xwe ye.

○.Pîrê hêviyê nebû şû biket, dema şû kir, daxwaza mal heştêkan kir.

Hewlêr Mezinava ye . . .

Ho xizmîno, erê we bihîstiyê Hewlêr Mezinava ye, hûn dizanin çende bêhn fireh û xwe ragir e! Tenê li roja cejna Qurbanê de, belê her li rojeke Qurbanê û li çav lêknanekê de, sed kes, sed dene gulên pêgihîştî kirine gofî.

Ew gulên ku her hemû bi dest hatibûn bijartin û çinîn û ji bo sîng û berê dayîka niştîman hatibûn pêşkêş kirin. Di nava wan gulan de, ên wa hebûn ku bi dehan daran ji mirinê zivirî bûn, yê wa jî hebû ku hêsta bêhna şîrê xaw ji devê vî dihat û dema ku canê nazîke wî ketibû ber seqema reşebayê tarîperestan, hêsta şîrînokên

cejna Qurbanê di nava destê wî da bûn û digot eger birîna min derman bibe, ezê wan şîrînokan bo cejna Newrozê bihêlîm ...

Belê, lewma dibêjim: Hewlêr Mezinava ye, bêhn fireh û xwe ragir e.

Îbrahîm kurê Nebî di Qurbanê de, di roja cejna Qurbanê de, xwest Simayîlê kurê xwe bike Qurbanî. Lê Hewlêra Hilako bidîn, Hewlêra paytextê herêma Kurdistanê, bi carekê û di çav lêknanekê de, sed kurên xwe kirine qurbanî û zaftir ji sedan jî li rêya qurban bûnê de hatine birîndar kirin.

Ewe cara yekem nine ku Kurd li cejna Qurbanê de Qurbaniyê didin, her li rojeke berî cejna Qurbana 1989'ê, li roja Arifeyê de bû ku pêxemberê Aştiyê, Dr. Qasimloyê nemir bi destê şevperist û kore peleşmêkên tarîti û nezaniyê hate teror kirin.

Belê, bûyera dil êşe Hewlêrê Kurdistan bi gund û bajarên we û Kurdên welatparêz jî di her aliyê ve cîhana pan û berfireh de xistine nava behî û kovanan.

Stêrk ketine nava şîne, çiyayên Kurdistanê jî rondik herikandin, Masî di nava çem û kaniyan de melûl bûn, bima biyom jî piçe piça wê bû û pêdikeniya, şev perestan jî girtibûne govendê.

Belê! Sipêdehiya roja yekê Şubatê, yekem roja cejna Qurbanê, heta bêjî cihê tirs û xofê bû, Kela Hewlêrê di nava mij û xumamê de bêhna xwînê bo tev Kurdistanê belav dikir. Cejn bûye kovan, şahî bûye şîn û behî, mirûsiyê hêlûna xwe di nava dilê hemû Kurdan de çêkir.

Çavên bedewe keçên Kurd ji kil û kildanan xeyidîn. Zarokên rûgeşe Kurd

kincên cejnê danîn û reşik girêdan.

Mamostayê xwendîgehê û xwendevan bi carek guhişîn, textereş jî ji geça sipî xeyidî û reşik girêda, şev peristan girtine govendê, Kunda biyom jî piçe piça wê bû, û dikeniya.

Ho xizmîno! Dê bêjin, bêjin Hewlêr Mezinava ye. Başê qey mezinatiya ji vênê mezintir heye ku li çav lêknanekê de, sed Beranên Qurbanî, stûyê wan bikeve ber kêra ji ol warî bûyî û zaftir ji sedan jî di rêya Qurbanê de bêne birîndar kirin. Başê eger eve meznatî nebe, gelo tu bêjî meznatî dibe çî be?!

Kovaneke zaf mezin e, ger Kurd nebe, vê kê bikare li ber vê kovana mezin xwe ragire, gelek daran derbên ji vênê girantir jî ji Kurdan ketine, lê pişt neçewandiye. Bêşik vê carê jî sê her wa be.

Min pir pirtûk û

kevne kitêb vekolîn, min serî ji zaf malên xanedan û mezinên Kurd hilanî, min penaya xwe bo gelek mêrmaqûl û zana ên Kurd bir û min destê xwe li ber wan girt, da ku peyvekê bidin min û ez bikarim terorîstan pê mehkûm û şermezar bikim, hemûyan bi hevra, bi yek deng gotin: Bo wê ku terorîst şermezar û rûreş bibin, bo ewê ku ji bo kore peleşmêkên terorîst perwer û wan nezanan ku dîni bi dinyayê difiroşin derkeve ku Kurd bi teror û tirsandinê rêya xebatê bernade û ji meydane dernakeve, hewceye em hemû bi hevra, bi yek deng bikin hewar û bêjin: **Bijî yekbûn, bijî Kurd, bijî Kurdistan.** Bila ev hewara me ji her aliyê Kurdistanê deng bide û hemû Kurd piştrast bibin ku rêya serketinê ji dergehê yek bûn û dîsan yek bûnê re derbaz dibe.

Encama hilbijartinê di bajarên Kurdistanê de

Seqiz û Bane:

Li gor nûçeyên ku gihîştine destê me ji 250000 kesên ku mafê deng danê di wî bajarî de hebûn, 62000 kesên pişikdarî di hilbijartinê de kirin e û ji wan kesane, 11000 kes ser bi hêzên nizamiyê rejîmê bûn, her wisa qasê 8000 dengên sipî jî di sindoqan hatine havêtin. Bi vî awayî jî jêvene ku destkarî û "teqelob" tê de hatiye kirin.

Bokan:

Di vî bajarî de jî 143000 kesên mafê deng danê hebûne ku pêka serhijmêriya Femandariyê 54000 kesên deng dane û ji vê qasê jî 5400 kesên deng bi Hacı Enwer Hebibzade û 200 kesên jî deng bi Îbrahîm Şewqî û berendamên din dane.

Pîranşar:

Di vî bajarî de jî 40462 kesên mafê deng danê hebûne ku ji vê qasê jî 7427 kesên deng dan e.

Mehabad:

Di vî bajarî de jî 140000 kesên mafê deng danê hebûne ku li gor nûçeyên rejîmê 32000 kes di deng danê de pişikdar bûne, lê li gor qise û basên xelkê tenê 700 kesên deng dane.

Urmiye:

Li gor nûçeyên ku gihîştine destê me li tax û herêmên Kurd akinciye vî bajarî tenê 10 ji sedêye xelkê pişikdarî di vî hilbijartinê de kirine û deng bi vî rejîmê dane.

Hejî gotinê ye ku li bajarên din ên Kurdistanê Îranê de jî qasê pişkdariya xelkê di hilbijartinê de zaf kême bûye.

Li Îranê jinek bi îdamê tê mehkûm kirin

Li gor nûçeyê rojnameya "Etimad", çapa Tehranê, qirar e ku **Kubra Rehmanpûr** di 28'ê Februarya 2004 (9'ê Reşemeya 1382'e Rojî), tê îdam kirin. Kubra Rehmanpûr (Jin) 22 sal temen heye.

Dijberiya nêrînan li dor Zagona Bingehîn ya nû a Îraqê

Li gor nûçeyan diviya roja şemiyê pêşnivîsa Zagona Bingehîn ya nû li Îraqê hatiba pejirandin. Civîna şewra Dêhilatdar li Îraqê heta bersibêdeya roja şemiyê dom kir, lê endamên sewrê li ser hinek xalên esliye zagonê bi encam negihîştin. Pişkek ji dijberiya nêrînan wan li ser Otonomiya herêmên Kurdistanê, rolê Islamê di hukûmetê û her wisan rolê Jinan di kar û barê welat de bû.

Mergewer

Perwîz Cîhanî



Çar nîkarê tev da çîyan e Mergewer
Her çîyayek gulistan e Mergewer
Dilhebîn e dilistan e Mergewer
Lawik heyran, stiran e Mergewer
Cergebez e wek dîlan e Mergewer
Gewriya Kewer, Bozê Sîna, li hember
Çendê xweş e, Girdesor, Geliyê Gader
Şabita û Dolewajî li raser
Warxatûn û Dolehmdan li pêşber
Hemû gul in, tev sor gulin seranser
Rêlê Bava, ev bişiyê dar û ber
Warmambiz û Kanîdizan kesk û zer
Mêrgezîyret, Beresipya, ser kever
Memê Şivan, pez li ber e ker bi ker
Li paşela, wan zozanan Mergewer
Navrûn û warê Sîna û Berê zer
Doletirşîn, li bintara Dalanper
Sermiluk û Binçol, gul in seranser
Geliyê bênarê kûr e her wek keser
Ev kesera, dilê min girtî li ber
Şêwesor û Beregewra tev gul e
Sêkuçe û kanîtext û Qul Qule
Her du qezen, sirt û qûç û sormil e
Sîngêbeybûnî beybûn e sorgul e
Zînî û Mayê, Helane ber dil e
Keviya hespê, wek hespekî li zincîr e
Geliyê Rebet, cîhê ra û nêçîr e
Sirtê Hecîc, ser sipî e wek pîr e
Çalehirça li bintarê êxsîr e
Kelankanî gel kaniyê wek şîr e
Befra serê Dalanperê bibîn e
Keviyê kevn û taze ser hev dimîn e
Çîyayê bilind, dawşîn û ser sipîn e
Ber qeremata dilê wan pir xwîn e
Lema hal hal li ser sîngan hêşîn e
Li pêşîra çîyan da deşta pan e
Gunda li bintarê da gul wedan e
Himêz kirî, çîya rêza gundan e
Destê hevra girtî wekî dîlan e
Gund jî hemû li zincîra wan da ne
Çi gundistan, şaristan e Mergewer
Şênistan e, gulistan e Mergewer
Daristan e, tev bostan e Mergewer
Tev çîmen e mêrgistan e Mergewer
Ber dilan e Kurdistan e Mergewer
Gund, gelek in îro li Mergewer da
Jarawa û Kanîdestar li ser da
Tezekend û Filikan li himber da
Lorzînî û Sûledûkel, pêşber da
Meliyan e li kêleka Şêxzerda
Xurasib û Bêrasib û Sûsinawa

Nowî, Kanîsipî, Eliyê, Bawa
Gêsiyan û Kolebihî, Çiriyawa
Keçele û Jereji û Şeqlawe
Dûr ra binêr, Dukana, Sêwdfnawa
Helec, li ber sorgulan gul gewez e
Kaniya wê ya her wek çemê Erez e
Hil dikel e, av heldêr e, qelwez e
Lê dikişê kerî û terş û pez e
Girik, li rex da hemû bax û rez e
Garane, Rezge, ketine dev riya
Nari û Dezgir li quntara çîya
Ewrîsi û Kelasi dev geliya
Melabastek, ku ciyê şengebiya
Kanîtabir, wek dermanê baviya
Li Dezgirê, dêra Fila bibîn e
Di gel ewê, goristana mêjîn e
Bizan e çi, li vê de bihorîn e
Mergewerê, perokeka neqşîn e
Wêrê gelek qeremat bi çav dîn e
Nêrgî xweş e xemrevîn e ciyê jînê
Navê vê ya neqş e li Kêleşînê
Ev şarê Kurda bûye li mêjînê
Li gelî da neqşa Ferhad, Şirînê
Şêxbazîd e xweş bas dike evînê
Memikane, Bobekrane Haftava
Giriknasir, Sêgirkan, Hêşimava
Şêrekan û Berezan, Mensûrava
Lacanî û Sorkan û Mîrava
Girdiwan û Qayir û Topizava
Diz e, gul e xemiliye li deştê
Zêwe birîndar e li rex teniştê
Hêjî li dil, dükela reş û heş tê
Holistan e çîmenzar li ber piştê
Mergewer e, xudê tîne, her tiştê
Gula dil e, xemiliye, reng bi reng
Kurdistana Îranê da, bi nav û deng
Wekî bûka Kurda ye zor şox û şeng
Dilrevîn e, xwe geş dike dilê teng
Dîmena vê paqij dike, taxt û jeng
Mergewerê, evîna te dilê min
Pûşê çola te ye ku sor gula min
Barê te yê giran e, ser milê min
Te av dide, her du çavên şilê min
Te bibînim, bîr ve diçe kulê min
Perwîz! eger, car din biçî Mergewer
Bêhin bike bo dilê xwe ax û ber
Ewê axa li sorgulan bûye ker
Têr bibîn e çil û çîyayên ser Kever
Kula dilê xwe yê birîn bike der

Jêder: *Bernameya Şaneşîn, MEDYA TV*

Ezîzê min

Aware Celalî

Min dibe ku derê babelîska
Evîna bin bizire te
Ez naxwazim ji vir biçim
Ez dixwazim
Di nav girovera evîna te da
Hêlûnek biçûk
Ji dilê xwe yê
Bêhemd ra çêkim . . . û
Di nav kenî û
Evîna te da
Semayê bikim

Xweştiviyê min

Tu yê xweştivî
Pêlên xwe
Bo her esmanekê
Bihawêy . . .
Tu caran nikarî
Hundirê keske xewnên min
Bi cih bihêlî

DAXWAZ

Berken Bereh (êş)

Dixwazim
Hew binase
Ew dilê delal
Ew dilê xweşik
Ew dilê tenik û mindal
Êş û janan
Bila bi binevş û beybûnan
bixemilîn
Xewn û xeyala
Bila tim bazdin bextewariyê
Ew destên hevrişimî
Çavên karxezal,
Û bila ji wê bedena te ya narîn
Tenduristî bifûre
Sibeh, şev û êvar!

**Ew helbeste ji malpera
www.amûde.com hatiye
wergirtin.**

Li Efxanistanê Jin: weke miroveke derece 2 tê hesibandin

Loyî Cergê û doza mafê Jinên Efxanistanê

Çinûr Qadirî

Zagona bingehîn, hilibjartin, Parleman û ... hwd ev peyv û mijarên bedew û xweşik in ku di guhê piraniya xelkê cîhanê ahengekî xweş heye, lê xelkê reben û belengaze Efxanistanê niha jî nikarin li dor pêşeroja siyasî a xwe li ser bingeha zagona bingehîn xweşbîn bibin.

Rûniştina Loyî Cergê li meha Decembara 2003'an li bajarê Kobolê dest bi kar bû ta ku mijolê bas û berhevda û pejirandina yasa û zagona bingehîn bin. Nêzîk 500 kes ji 32 parêzgehên Efxanistanê di vê rûniştinê de pişikdarî kirin da ku çarenivîs û qedera xelkê wî welatê li bîrcûyî û nemaze Jinên zilmjêkiriye Efxanistanê, diyarî bikin. Serbarê ev hemû deng û basên ku qirar bû hilibjartinek cuda ji bo Jinan were lidarxistin û di rûniştina han de çend rûniştekan (sendelî) ji bo berendamên Jin hatibe mizext kirin, bo hinek ji Jinên berendam ku hêvî û xweziya wê çendê hebûn ku bikarin biryar û pejirandiyên zagonî bi qazancê Jinan bidestve binin, hinek name bi naveroka hereşe û gef kirinê ku diviya li berendam bûnê xwe biparêzin, nexa jiyana wan li xeter û tirsê de ye, Bi awayeke tund gef ji wan hate kirin, ku dest ji berbijêr bûna xwe bikişînin. Hinek ji wan Jinan dan xuya kirin ku rayedarên Efxanistanê ev ji beşdarî kirin di Loyî Cergê de dilsar kirin. Di parêzgeha Parktika heta Jinekê jî xwe berendam nekir. Li bajarê Parvanê Melayan bi terzek eyan û êşkere îlan kirin ku Jinan mafê pişikdarî kirin di hilibjartinê de nînin. Digel hemû ev gef û lafane qasekî kêr ji Jinan xwe berendam kirin, ji ber ku dizanin ku pejirandina zagona bingehîn bi destê wan kesane ye ku karnameyeke bixwîn û dijî mirovahiyê hene, rastiyek e bo bêpar bûna Jinên Efxanistanê. Her ev hinde ku yek ji rêberên berê yê Mucahidînên Efxanistanê yanî Pîr Seyîd Ehmed Gîlanî wek serokê demî yê Loyî Cergê vê rastiyê bo me diselimîne ku çî kesane di pejirandina zagona bingehîn de dest û bandor hene.

Di roja sêyem a meha



Jinên Efxanistanê tîn perçiqandin

Novembara 2003'an de tenê pêşnivîsa zagona bingehîn hate weşandin. Terhek ku heke em nezanin ku kê nivîsandiye û berhev kirî ye, bêşik gumana wê çendê dibû ku Taliban û alîgirên wî rolê eslî di berhev kirina wê de hebûne.

Ev terhe di destpêkê de bi vê hevokê dest pê dike ku: "Em gelê Efxanistanê ligel baweriya me bi xudayê mezin û piştrast bûn bi dilovaniya wî û bawerî bi olê pîroze Islamê ... nîzama Efxanistanê bi Komara Islamî nas dikin"-mada yek, pişka 1, benda 1- û paşan bêşik û guman îlan dike: "Olê Efxanistanê, Olê Islamê ye"-mada 2, pişka 1, benda 2- "Rojhejmar dibe li gor "hicret" a Pêxember bibe"-mada 18, pişka 1, benda 18- "Li ser alayê tê nivîsandin, ji billî Elah çî xudêyeke din tune ye û Mihemd Pêxemberê wan e"-mada nozdehan, pişka 1, benda 19- "Serok Komar divê Misilman be" û ... Bi wî awayî bê çî lê û egerekê li ser huwiyeta Islamî bûna wê pêşnivîsê tekez tê kirin û niha olî bûn li bend-bendên zagona bingehîn bi ronî kifş û eyan dibe.

Li gor yasayê azadî bi giştî tîn berbend kirin

Di zagona navhatî de çî nîşaneyek ji eslên bingehîn ên Demokrasi û Sekolarîzmê nahên xuya kirin, di terhê han de, li cuda bûna ol û siyasî, ne ji azadiya hizr û ramanê û heta azadiya ol û meseb jî bask tune ye, lê di vî terhî de bi êşkere hatiye ku çî Partiyek siyasî û zagon û axaftinek, nabe tevî olê Islamê natebahî û dijberî hebe. "Mafê pêk anîna partiyên siyasî azad e, bi mercekê ku digel olê pîroze Islamê û made û nîrxên zagona bingehîn dijberî çî nebe"- Mada35, pişka 2, benda 14

Ji bo dewletekê ku naxwaze ol û

siyasetê ji hev veqetin, hewce ye bandora cuda nebûnê di hemû warên jiyana xelkê bi rêya yasayî derkevin rojevê. Perwerde û Elimandin ji wê eslê (cudabûnê) bê par nine. Hemû wane û dersên xwendinê û kulturên neteweyî li gor yasayên olê Islamê werin berhev kirin. Ji bo meşandina kar û barên rojane ên xelkê û hukûmetê û perwerde û hîn kirina nifşa nû, dîn rolê eslî û bingehîn heye û ji sekolarîzmê çî deng û bask nine. Her liv û hereketek dijberî ol be, dibe were tepeser kirin.

Mafê Jinan di pêvajoya yasaya Bingehîn a nû:

Rewşa han Jinê weke miroveke derece 2 dihesibîne

Niho em bihên, bizanin ku di terhê han de Jin çawa bi mafên xwe digihîjin. Ew terhe bi êşkere yasayên pejirandiye olî bi jiyana xelkê û nemaze Jinan tevlihev dike. Lewre ol û zagona nû, li ser Jinan bêbandor nabe, çunku li çarçoveya yasayên oliye van de Jin, zû tê perçiqandin û rê ji bo parastin û bîncav kirina mafê takekese mirovan ji hêla rayedarên dadmendiye van ku tevî mafên mirovan û mafê Jinan dijberî heye, diveke. Di wê pêşnivîsê de li hember zewacên bi zor û li ser neçariyê û her weha zewacên zû û pêşdem û kêr temen ne tenê piştgirî nahê kirin, çî neyarekê jî tevî sûçbar bûn û hepsî û îşkence kirina van Keç û Jinên ku amade nînin wê biryarê bipejirînin, nake. Ji bo Jinan mafê kar kirina wekhev û adilane û azad nehatiye pejirandin. Ji mafê beramber li hember karê beramber de çî nehatiye gotin. Mafê xwendinê bo Jinan û mêran wekhev nehatiye diyarî kirin. Tund û tîjiya mêran li malê de û tecawîz bi Jin û zarokan, sûç nehatiye hesibandin. Li hember kuştinên namûsî de çî nehatiye berçav girtin. Rê ji bo perçiqandin û bin pê kirina mafê Jinan û bêpar kirina van ji destpêktirîn mafên xwe, li gor zagona sedsalên destpêke vekirî dihêle. Çarçoveya kar û xebata Jinê tenê kar kirin li malê weke paqij kirin, şuştin, perwerde û xwedî kirina zarokan û ... hwd hatiye berçav girtin û mêr weke malik û xwediyê Jinê tê hesibandin. Jin wek rihberêk tê xuya kirin ku tenê li xizmeta mêr

Şûn pêyê jinê di Komara Islamî a Îranê de

Hemîd Muxtarî

25 salan berî niha dema ku di Îranê de şoreş pêk hat, piraniya jinên Îranê mil bi milê mêran bi awayeke yekgirtî hatine meydana xebat û azadiyê û rûpelek nû ji dîroka Îranê wedan, ji ber ku wisan difikirîn ku derheq cî bi cî kirina kêmasiyên wan ên hiqûqî vê gavên mezin bîn avêtin, lê dema ku melayan deshilat girtine dest xwe, bi pêk anîna hukûmeteke babsalarî dest bi bînpê kirina mafên jinan, bê hurmetî bi keramet û kesayetiya jin û kevirbaran kirina wan kirin û her wisa tewaya mafên wan derbarê kar kirin û wergirtina berpirsyaretiyan di postên sereke ye welat de ji wan hate standin, bi taybetî li gor zagona bingehî ji mafê qezawet kirin û posta Serok Komariyê hatine bê par kirin. Her wisa piştî vê jî hinek ji deskevtên hiqûqî û civakî ên wan jî hatine bînpê kirin. Ev cinayetane li demekê de rêve diçûn ku rewşa jinan li zaf welatên cîhanê de heta qasekê ber bi baş bûnê diçû.

Hejî gotinê ye ku ewa bi sala ye pîrsa dadgehî kirina Komara Islamî di dadgeheke cîhanî de seba wan cinayetên hovane dijberî gelên Îranê lêre û livê hatiye holê, lê binyatên navnetewî hêşta nekarîne vê rejîmê seba cinayetên vê dijberî mirovan bikêşne dadgehê. Renge hizir kirineke bicî be heke bê gotin ku eger kiryara binyatên navnetewî nîşaneya bê şiyaniya wan binyatane nebe, bes nîşana zîrekatiyê û şiyana vê rejîma bi nav Islamiye ku kariye bi mifah wergirtin ji valahiyên heyî li têkeliyên navnetewî û dan û standinên siyasî bi merema bê bandor kirina wan binyatan bimeşe û kêman zor cinayetên xwe dijberî mirovan bidomîne.

Di vê rejîmê de jin rihberek bê biha ye ku kêrhatiyê çî mafêke mirovî û civakî nine û tenê wezîfeya vê parêzvanî ji koma germ a malbatê ye û dibe li jêr deshilata mêr de be. Yanî rejîm hewil dide da ku ji jina îranî jineke "teraz mekteb" pêk bîne, yanî jinek ku qebûl bike ciyê esliye vê di nav mala mêr de ye û tenê vê demê dikare here derê ku bo xwedî hêz kirina sîstema mîrsalariyê hewce û meslihet be.

Li gor yasaya bingehîn a Komara Islamî a Îranê pêwaneya jineke

xudan mêr tevî kesekê ku mêrê vê nebe, destdirêjiyeke bo ser sitûnên malbatê û hêsiyet û abrûya mêr diçe û destdirêjiyeke bo ser îdeolojiya Islamî û cizayê vê kiryarê mirin e, ev jî bi awayeke herî dil êş yanî kevir baran kirin.

Bi wî terzî bê hurmetî û şikandina keramet û kesayetiya jinan li jêr deshilata Komara Islamî de bûye karek fermî û kes nikare berevaniyê ji mafên Jinan biket her wisa di yasaya bingehîn de hatiye ku posta serkomarî posta Qazîtiyê û postên girîng dibe ji destê "Recalê Siyasî" de bin û bi wî terzî em dibînin jin weke nîva civakê bi terzek fermî li pişikdarî kirin li kar û barên siyasî û qezayî hatine bê par kirin. Ji dîtingeha rayedarên rejîmê ve jin nivê mirovekê ye û taybetmendiyên eqlanî û hizir kirina mirovekî tewaw çinine, lewma li ser bingeha wan hizir kirin û baweriyên paşverûyane ye ku li tewaya yasa û rê û cihên xwe de ferq û cudahiya herî zaf derheq jinan bi kar tînin û wan ji mafên siyasî û heta mirovî jî bê par diket û her rojê yasayên mîrsalarane û dijberî jinê dipejirînin û pareke mirovên vê civakê yanî jin dikevîne ber êrîşên paşverûyane ên Islamî û teesuba kor a mîrsalarî. Bi kurtî merema eşkere û zelale wan melayan eve ye ku dixwazin zulm û sitem û tepeserî a jinan di Îranê de bikine pîrsek edetî û bi awayekê ku evên tûşî wan cirm û cinayetên bibin destê wan bo her cinayetekê dijberî jinan bi tewahî vekirî be û li warê yasayî ve nehêne şopandin.

Helbet ev zulm û zor û tepeserî bi giştî li tewaya pîrsên cur bi cur de ji aliyê jinan ve bê bersiv nemaye û namîne. Jinên Îranî ji rêyên cur bi cur û bi mifah wergirtina ji her emraz û îmkanekê dijberî wan ferq û cudahiyan dest bi xebatê kirine û heta aliyên vê xebatê bi awayekê çûne pêş ku îro pîrsa jinên Îranê û xwastikên wan ji rejîmê bûye pîrsgirêkeke micî ku bala raya giştîye cîhanê ji bo aliyê xwe rakêşa ye û dana xelatê aştiye nobela îsal bi Şîrîn Ebadî nimûna piştgîriya raya cîhanê ji jinên Îranê

ye û lewman rêberên vê rejîmê neçar kirine ku hindek qewl û sozan bo çêtir kirina vê rewşê bidine jinan. Lê hêşta ev soz nehatine cî bi cî kirin.

Ku wisa ye, tenê rêya nehêlan û bin bir kirina zulm û zor û tepeseriya jinan di Îranê de û pêkanîna tenahiyeke navgîn li jiyana wan de, ji nav birina zagona kevirbaranê, teror, zindan kirin, îşkence, îdam, kom kuji û ava kirina civakeke xelksalar û demokratîk, li girewa ji nav birina rejîma komara Islamî a Îranê de ye.

Çavkanî: Pirtûka mafê siyasiye Jin di Îranê de, û pirtûka Konfiransa Birlîn

Loyî Cerge û doza mafê Jinên Efxanistanê

Doma rûpelê 18

de be û mafê serxwebûna wê di hemû warên jiyane jê hatiye zevt kirin. Di Qanûna han de mêr li rêya fermî û zagon ve weke xwediyê malbatê bi giştî ye û li ser qeder û çarenivîsa Jin û zarokan mafê tam heye û çî beramberiyek di navbera Jin û mêran nine û nikarin vê pîrsê li yasayên xwe de cih bikin, ji ber ku ligel ol dijberî heye. Di wê yasayê de kesayetiya hiqûqî a Jinan hatiye bin pê kirin û mafê Serok Komar bûn û cihgirê wî tenê bo mêran hatiye pejirandin! Di dukomentên zagona bingehîn hatiye: *"Dewlet ji hemû cure kiryarên terorîstî û qaçaxa mewadan pêşgiriye dike"*, lê çî îşareyekê bi qaçaxa mirovan nake, bazirganiyek hovane ku goriyên vê Jin û zarok in. Temenê zewicîne ji bo keçan 9 salî hatiye diyarî kirin û ev ji jiyana azad a temenê zarokatiya xwe tîne bê par kirin. Jin û keçên Efxanî mecbûr in ku serê xwe girê bidin û ... Rewşa han Jinê weke miroveke derece 2 dihesibîne.

Ew terha nû ya Loyî Cergê ku kete ber bas û lêkolînan, guhertinek zaf li gor yasayên Taliban tê de nahê dîtin, aliyê kêman bo Jinên belengaze Efxanistanê civakek azad û demokratîk nabe û hemû azadiyek tê berbend kirin.

Bi hêviya rojekê ku azadî û wekheviya mafê mirovan bi giştî û mafê Jinan bi xasmanî weke yek ji eslên bingehîne zagonên welatên mîna Efxansitanê û ... bi fermî bihê nas kirin.

Jêder: Malpera "iran emrooz"



agirî

Rojnameyeke siyasî û çandîye, Partiya Demokrat a Kurdîstana Îranê diweşîne
Hejmara 4, Februarya 2004

Navnîşan:

AFK
B.P. 102- 75623 Paris
CEDEX 13 –FRANCE

<http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/kurmanci.htm>

Email:

Rojnama_agiri@yahoo.com

Fax: 0012703425105

Bo Agirî binivîsîn

Eger bo Agirî dinivîsîn ji kerema xwe van xalên jêrîn berçav bigirin:

- * Çi nivîsek bê nav û nîşan nayê weşandin. Nivîskar dikare navê dilxwaz bo nivîsa xwe hilbijêr e, Digel navê dilxwaz ji kerema xwe navê xwe yê rastî bo rojnamê bişînin.
- * Eger nivîskar ji bo nivîsîn û berhev kirina mijara xwe ji çavkaniyan mifah wergirtibe, hewce ye îşare bi van jêderan biket.
- * Ev nivîsên ku li zimanên biyanî hatibin wergêrandin, hewce ye îşare pê bê kirin û nav û nîşana jêderê jî bihê dest nîşan kirin.
- * Hindî bikarin wêne, xerite û belgenamên hewce tevî nivîsan bo me bişînin.

**Desteka nivîskarên
Rojnameya Agirî mafê vê
çendê heye ku:**

Destêwerdana rênûsa nivîsan biket.
Van mijar û babetên ku naverokek lawaz hebin belav neket.

Daxuyaniya Deftera Siyasî a PDK Îranê Derheq kiryarên terorîstî yên vê dawiye li Bajarê Hewlêrê

**Hevwelatîyên birêz!
Xortên xwedî şan û
şerefe neteweya Kurd!**

Pêşnîvroya roja yêkşemî 12'ê Rêbendana sala 1382'e Rojî (01.02.2004'ê Zayîni), li demekê da ku xelkê bajarê Hewlêrê cejna pîroze Qurbanê birêve dibirin, du buroyên tayê 2 yê PDK'ê û Melbenda 3 a YNK'ê li Hewlêrê hevdem ketne ber du êrîşên terorîstî û di encama wan du kiryarên terorîstî da, mixabin 57 kesan jiyana xwe ji dest dan ku di nava goriyên wan kiryarên terorîstî ên roja cejna Qurbanê da hejmarekî berbiçav ji kesayetî û kadroyên kevnar û pêşkevtî, berpirsyarên dezgehên hizbî û hukmiye her du partyên sereke, PDK'ê û YNK'ê tînan xuya kirin û zêdetir ji 150 kes jî birîndar bûn.

Encam dana wan kiryarên



Terorîstan cejn ji Kurdan tal kirin

terorîstî li bajarê Hewlêrê vê rastiyê didin xuya kirin ku terorîst û mirovkujên ku heyamê çend meheke bajar û cihên cur bi cure navenda Îraqê kirine hêla kiryarên terorîstî di şekl û awayên cur bi cur de, çavên wan bi vê tenahî û aştî û aramiyê ku di bin sîbera deshîlata Hukûmeta Herêma Kurdîstanê li her du îdareyên Hewlêr û Silêmanyê de bo gelê Kurd li Kurdîstana Îraqê hatiye misoger kirin, na vebe û cehd û xebitîne dikin ku bi pîlangêran û komkujî û encam dana kiryarên terorîstî, vê tenahî û tenahiyê tîk bidin û xelkê Kurdîstanê tevî nigeranî û bê hêvîtiyê rû bi rûr bikin.

Doma wê di rûpelê 6'ê de bixwîne

Teqîna şemendefirekê li Xurasanê pitir ji 180 kes kuştin û pitir ji 350 kes jî birîndar kirin

Sibêdehiya roja çarşemî 29'ê Rêbendanê (09.02.2004), li 20 kîlometriya bajarê Nîşabor, nêzîk rawestgeha Xeyam, teqînek li Wagonên Şemendefirekê de ku hilgirê Gogird, Mazot û Benzîne bû qewimî. Li gor nûçeyê Televîzyona Îranê ev bûyere bû sedema kuştina pitir ji 180 kes û birîndar bûna aliyê kêma 350 kesên din.

Di encama teqîna wê Şemendefirê de mal û avahiyên 3'ê gundên nêzîk bi vê rawestgehê wêran û xirab bûn. Li gor gotina Femandearê Nîşaborê, sedema vê teqîne, hejiyana Şemendefirê bi egera Erdehejekê bûye ku rijdiya vê 3/6 Rîşter bûye.



Gelê Kurd li Kurdîstana Îranê bi baykot kirina Hilbijartinê "NE" bi Komara Islamî gotin

Roja 1'ê Reşemeya 1382'e Rojî (20.02.2004), gera 7'an ya hilbijartina Parlemana Islamî a Îranê hate meşandin. Gelê Kurd li Kurdîstana Îranê tevî gelên din li seranserê welat bi qasekî zor kêma di hilbijartina **NE DEMOKRATÎK**'e han de beşdar bûn. Emê di rûpelê 16 a vê hejmarê **Agirî** de raporek li ser qasê beşdar bûna xelkê Kurd li Kurdîstana Îranê pêşkêşî ve xwendevanan bikin.